ROJEV

19 Nîsan - Yekşem 2009 Buha: 50 Kr Hejmar: 4

Hişyariya 'şerê bi sînor'

Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan ji ANF'ê re ragihand ku destê wan ê ji bo aştiyê dirêj kirine li hewa maye û li hemberî êrîşan dê bêdeng nemînin. Karayilan hişyariya şerekî bi sînor kir û li hemberî operasyonan banga hêzên parastina xwe-bixwe kir ku bikevin nava tevgerê. Karayilan got heke rewş bi vî rengî bidome dê biryara bêçalakiyê ji nû ve di ber çavan re derbas bikin. Karayilan, got heke rewş wiha bidome hêzên wan dê amadekariya şerekî parastinê bikin, dê pratîkeke ku salên 90'î li paş xwe dihêle nîşanî her kesî bide.

Însiyatîfa Gelê Kurdistanê: Gulen û AKP ji bo me hedef in... R-4

DOZGER PIRSÊN SKANDAL JI BINÇAVKIRIYAN PIRSÎN:

We parlamenter çawa diyar kirin?

Dozgeriya Amedê pirsên skandal ji DTP'iyên di bin çavan de kirin. Dozger pirsa; 'We namzetên parlamenteriyê yên filan bajaran bi kîjan erkê diyar kirin?' ji rayedarên DTP'ê kirin

BERSIVA PIRSAN LI CEM YSK'Ê NE

Derket holê ku tu bingeha hiqûqî ya zext û zora li hemberî rayedarên DTP'ê tê meşandin tune ye. Dozgeriya Amedê pirsên balkêş ji binçavkiriyan kirin û ew bi hincetên ecêb şandin girtîgehê. Aşkera bû ku rêveberiya DTP'ê bersivên hemû pirsên ku dozger der barê hilbijartinê de hatine kirin bi belgeyên fermî ji saziya dewletê YSK'ê re pêşkêş kirine.

AYNA: EM Ê GILIYÊ DOZGERAN BIKIN

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna jî li hemberî bêhiqûqiya ku li dijî partiya wan pêk hatiye sekinî û wiha got: "Ên ku nûçeyên derew û bêbingeh der barê partiya me de weşandine, dozgerên ku agahiyên derew dane ragihandin, bêhiqûqiya di binçavan de pêk hatiye em ê gilî bikin. Em ê der barê dozgerên bûne sedema vê bêhiqûqiyê de jî gilî bikin."... *RÛPEL - 4*

Çend pirsên balkêş û sosret ên dozger pirsîn:

- We namzetê parlameneteriyê û yê şaredariyê yê filan bajar û filan navçeyê bi kîjan erk û berpirsyariyê diyar kir?
- We ji bo pîrozbahiyên Newrozê şaredar û parlamenter bi kîjan erk û berpirsyariyê şandin bajar û navçeyê?
- We di dema diyarkirina serlêdanên namzetên şaredariyê de bi kîjan erkê serlêdanên bernamzetan qebûl kirin?

Li Amedê 51 nûnerên saziyên kurd hatin girtin

Li Amedê ji 53 kesên di çarçoveya operasyona li dijî DTP'ê hevdemî li 15 bajarên wekî Amed, Îzmîr, Şirnex, Mêrdîn, Êlih, Dêrsim, Stenbol, Enqere, Aydin û Edeneyê bi talîmata Serdozgeriya Komarê ya Amedê hatibûn pêkanîn de hatibûn binçavkirin 51 kes bi hinceta "Rêveberên rêxistinê ne" û "Endamên rêxistinê ne" hatin girtin. 2 kes hatin berdan. Li navçeya Norşînê ya Bedlîsê ji kesên hatibûn binçavkirin 5 kes hatin girtin... *R.4*

Duh jî serdagirtinên polîsan ên li dijî saziyên çandê yên li Stenbol û Amedê dewam kirin... *Rûpel - 4*

Ji sazî û dezgehan hişyarî: Operasyon dê bibe sedema înfialeke mezin... *Rûpel - 4*

ROJ TV

'Me soza girtina Roj TV nedaye'

Tirkiyeyê di civîna NATO'yê ya Strazbourgê de di bedêla erêkirina Sekreteriya Giştî ya NATO'yê de ji Danîmarkayê xwest ku Roj TV'ê bigire. Lê Sefîrê Danîmarkayê yê Enqereyê Vahr got ku ew sozeke wisa nikarin bidin hin kesan. Sefîr diyar kir ku li Danîmarkayê der barê Roj TV'ê de lêpirsînek heye û ew didome... *R. 6*

ROJEV:

Dê îfadeyê Erkmen bê girtin

Li Basaya Şirnexê di sala 1996'an de di wesayîtek hatî şewitandin de 11 gundî hatibûn şewitandin. Dewletê bûyer avêtibû ser PKK'ê. Piştî 13 salan Wezîrê Dewletê yê wê demê Adnan Erkmen, gotibû "Komkujî ne ji aliyê PKK'ê ve ji aliyê JÎTEM'ê ve hatiye kirin". Serdozgeriya Komarê ya Amedê ku ji nû ve dosya vekir û çav li rê ye ku dozger têkildarî mijarê serî li îfadeya Erkmen bide… *RÛPEL - 5*

Çalakiyên ÎHD'ê didomin

Çalakiya ÎHD'ê ya 'Bila winda bên dîtin, kiryar bên darizandin' didome. Li Êlih, Enqere û Îzmîrê xizmên windayan hatin cem hev û wan xwest ku berpisyarên kuştinan bi lez bên dîtin

Komeleya Mafên Mirovan a Êlihê di çarçoveya çalakiyên "Bila faîl bên peydakirin kiryar bên darizandin" de li ber Abîdeya Mafên Mirovan a Kolana Gulîstan daxuyanî da çapemeniyê. Şaxa ÎHD'ê ya Enqereyê di çarçoveya çalakiyên xwe yên têkildarî windayan ku her hefteyê li dar dixe, li ber Abîdeya Mafên Mirovan ya li Kolana Yukselê daxuyaniyek da çapemeniyê. Endamên Şaxa ÎHD'ê yên Îzmîrê li ber Sumerbanka Kevin a li Konakê hatin cem hev û pankarta "Bila winda bên dîtin, kiryar bên darizandin" vekirin… *RÛPEL - 3*

TIRSA MEZIN

Li Berwariyê çi diqewime?

Li Navçeya Xisxê (Perwarî) ya Sêrtê di 5'ê nîsanê de Esma Selçûk (2) û Kadîr Adiguzel (4) winda bûn. Esma Selçûk di bîrek avê de li ber mirinê hate dîtin. Kadîr Adiguzel jî di heman bîrê de mirî hate dîtin. Ahmet Selçuk (2) winda bû û ew birîndar li qadeke vala hate dîtin. Herî dawî Aysel Selçûk (4) winda bû 2 saet piştre li bîra avê ya li nêzîk YÎBO'yê mirî hate dîtin... *R.3*

Rewşa têkiliyên Îran û Amerîka

Polîtîkayên Amerîka, bû sedem ku îdeolojiya Îslamî bi awayekî herî dogmatîk li Îranê pêşkeve. Êrîş û asîmîlasyona çandî ya li ser gelê Rojhilata Navîn ku bawerî û çanda olî di nav de bi bandor e, rê li ber derketina hêzên radîkal vedike

CEMŞÎD ENSAR

Di sala 1979'an de piştî dagir kirina sefareta Dewletê Yekgirtiyên Amerîka li Tehranê ji aliyê parêzvanê rejîmê ve, têkiliyên herdu welatan ber bi hişkbûneke bêsînor ve çûn. Ev pêvajo heya roja îro jî berdewam dike. Beriya şoreşa Îslamî yek ji mutefikên esasî yê Amerîka dewleta Îranê bû. Lê bi avabûna şoreşa Îslamî re Amerîka nikarî li ber xwe bide, demek ji yê din zûtir hemû saziye xwe ji Îranê vekişand. Îran di herêma Rojhilata Navîn de bû yek ji muxalifên esasî yê Amerîkayê.

Siyaseta Amerîkayê

Polîtîkayên pragmatîk, êrîş û asîmîlasyonên çandî yên Amerîka, bû sedem ku îdeolojiya Îslamî bi awayekî herî dogmatîk li Îranê pêşkeve. Êrîş û asîmîlasyona çandî ya li ser gelan, bi taybetî li ser gelê Rojhilata Navîn ku bawerî û çanda olî di nav de bi bandor e, rê li ber derketina hêzên radîkal vedike. Wekî mînak di roja îro de pir diyar e ku yê herî zêde li dijî êrîşên Amerîka berxwedanî dikin hêzên olî yên radîkal in. Ger ji herikîna pêşketina xwezayî ya civakê re, rê neyê dayîn, pêşketina hêzên radîkal dibe mijara gotinê. Siyaseta Amerîka ku li Îranê da meşandinê jî ev bû ku bi darê zorê çand û baweriya gel, bide guhertinê. Lê dewran berjovajî bû û şoreşa Îslamî bi razîbûna gel ve hate damezrandinê. Her çiqas di serî de siyaseta Amerîka bi van pêşketina re ne nakok be jî lê bi demê re derket holê ku ev hêz ji bo siyaseta Amerîkayê kelem in. Lê şoreşa Îslamî ji bo ku ji aliyê gel ve dihat destekkirin, Amerîka mecbûr ma wê qebûl bike. Îro Amerîka hewl dide ku bi navê têkoşîna li dijî terorê yan jî bi mebesta ku alîkariya terorê dikin, van hêza tecrîd dike yan jî tune hesab dike. Ev nêzîkbûn wekî stratejiyeke esasî ya demdirêj, ji hêla Amerîka ve tê pêkanînê. Rejîma olî û paşverû li dijî polîtîkayên Amerîka li ber xwe dide, ev yek jî vêya nîşan dide ku li gel baweriyên olî, cewherê mirovê Rojhilata Navîn jî di nav berxwedanek mezin de ye. Bi awayekî xwezayî hatiye îspatkirin ku cewherê mirovê Rojhilata Navîn biyaniyan qebûl nake. Îro Amerîka êrîşî hêzên demokratîk jî dike. Ji ber ku nûnertiya "demokrasi"ya ku Amerîka dixwaze nakin. Hêzên kapîtalîst bi dîroka xwe nîşan dane ku sîstemê ku li gor wan nebe, dixwaze olî be yan jî demokratîk be qebûl nakin. Ev jî durûtiya vê sîstemê pir aşkera dide xuyakirinê. Li berambêrî vê siyasetê xweparastina civakên Rojhilata Navîn bi hezarê salan berdewam kiriye. Veger li cewherê esasî û pêşxistina demokrasiyê, rê li ber vê vedike ku sîstema Rojhilata Navîn dibe dij-tezeke ji bo sîstema heyî. Amerîka, ji bo ku jê re tu alternatîf dernakeve holê, hewl dide ku tu carî rê nede di herêmê de bê destûra wê demokrasî pêk were. Armanca modernîteya kapîtalîst jî ew e ku cewherê civaka xwezayî bikuje ta ku bikaribe otorîteya xwe biparêze. Berxwedana vî cewherê bi hezarên sala, bû sedem ku Amerîka rêbazên dîplomatîk hilbijêre. Bi desthilatdariya Obama re vê serdemê dest pê kiriye.

Piştî 11'ê Îlonê, polîtîkayên Amerîkayê der barê cîhana Îslamî de, di 3 xalan de pêşket:

1. Şerê cîhanî li dijî "terorîzm"ê,
2. Pêşxistina projeya Rojhilata Navîna Mezin û serdema reforman,
3. Bikaranîna "rêbazên dîplomatîk"

Armanca vê yekê ew bû ku Amerîka pirestîj qezenc bike û xwe wekî împaratoriya cîhanê bide nîşan dan. Li gelek deverê cîhanê di vê polîtîka xwe de israr kir û mirov dikare bêje ku heya astekê jî bi ser xist. Mînak li dewletên wek Tirkiye, Pakistan, Malêzya û Urdun ku misilman in, projeya "Îslama nerm" pêş xist. Dewleta Îranê li dijî vê pirojeyê li ber xwe da. Amerîka jî di vê dema dawî de hewl dide ku bi rêbazên dîplomatîk di vê mijarê de Îranê razî bike.

Desthilatdariya Obama

Bi desthilatdariya Barack Obama re serdemek cuda dest pê kiriye. DYA hewl dide bi giştî di cîhanê de û bi taybetî jî li Rojhilata Navîn, rêbazên siyasî yê nû pêk bîne. Piştî ku hate zanîn ku Îran sedemê qeyrana aborî û pirsgirêkên xwe yê hundirîn wek Amerîka nîşan dide, vî welatî li cihê tehdît û rêbazên zextê, rêbazên dîplomatîk ji berê zêdetir da pêş. Ev tê wateya armanca pûçkirina siyaseta navxweyî ya rejîma Îranê. Ji bo vê jî Îran xwe nêzîkî vê hewldana Amerîka nake. Hêjaye ku li vir şibandinekê bikim ku berê ji bo tirsandina zarokan digotin, "hiş be gur hat!" Îranê jî digot "hiş bin Amerîka hat" û bi vî rengî gel dixapîne. Di vê serdemê de nermbûna Amerîka li hemberî Îranê, bû sedem ku Îran siyasetê xwe ya xapandinê di ber çavan re derbas bike. Amerîka ji bo ku siyaseta xwe bi ser bixîne, Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) jî ku bi salan e Têkoşîna Azadiyê û demokrasiyê dimeşîne, weke tevgerek "terorîst" nîşan da. Îro tê dîtin ku dijminê hev yên 30 salan ji bo ku li hev werin Tevgera Azadiya Gelê Kurd bi awayekî xwînxwarane û ne hiqûqî dikin mijara bazarê. Qaşo dixwazin di Rojhilata Navîn de demokrasiyê pêş bixînin. Lê di pratîk de derdikeve holê ku armanca esasî terorîst îlankirina Tevgerê Azadîxwaz e, ne pêşxistina demokrasiyê ye. Tê zanîn ku di dîrokê de gelan demokrasî pêş xistiye ne dewletan. Bi kurtî demokrasî mîrateya gelan e.

Siyaseta Rejîma Îranê

Yek ji dewletê herêmê Îran e ku 30 sal in bi polîtîkayên teslîmgirtinê re rû bi rû ye. Ne li ser esasê dînamîkên hundirîn ne jî bi bandora dînamîkên derveyî guhertinê pêk tîne. Bi nêrîna dijîtiya bi Amerîka re dixwaze hebûna xwe berdewam bike. Rejîma Îranê ji bo ku desthilatdariya xwe berdewam bike her tim hewl daye ku çend hêzên dijber ji xwe re çê bike. Ev hêza dijber yek Amerîka ya din jî Îsraîl e. Bi giştî kêm û kurtiyê ku derdikevin holê yan jî pirsgirêkek derkeve sedem ev her du hêz tên diyar kirin. Bi vî rengî gel jî îkna dibe û slogana "Bimre Amerîka û Îsraîl" ji berê zêdetir davêje. Amerîka ev yek ferq kiriye û di vê serdemê de destûr nade ku Îran vê yekê weke lîstokekê bi kar bîne. Di vê demê de bi giranî hewl dide bi rêbazên nermtir nêzîkî Îranê bibe. Bêguman Îran nikare bê muxalîf, xwe li ser piya bigire. Ji bo vê jî wê hewl bide ku nêzîkbûnê dîplomatîk qebûl neke. Vê yekê di helwesta xwe de her tim dide diyar kirin. Siyaseta rejîma Îranê ya ku Amerîka her tim dijminê Îslamê dida xuya kirin, êdî vala derdikevin. Îran, bi bandora çanda Zerdeştî ya li ser gel, parastina çanda xwe ya xwezayî û pêkanîna sîstema xwe ya konfederatîf dikare, bê ku mineta Amerîka û yê din bikşîne xwe ji paşverûtiyê û dogmatîzmê rizgar bike û xwe bigihîne demokrasiyê.

Awêne

Samî Tan
sberbeyan@yahoo.com

Erdogan li ser şopa Menderes dimeşe

Carinan azwerî çavên mirov kor dike. Wisa li mirov tê ku êdî mirov ber xwe nabîne. Azweriya herî tund û dijwar jî azweriya rûniştina li ser textê desthilatiyê ye. Ew kursî tiştekî wisa ye ku kî carekê li serê rûdine, naxwaze careke din rabe.

Dek û dolabên di qesr û qonaxên şah û padîşahan de giş ji bo bidestxistin an jî jidestendana desthilatiyê ne. Hin caran dema pêwîst kiriye, vê azweriyê bira bi birê daye kuştin. Bi kurtasî ev nexweşiyeke xeternak e.

Niha jî di serî de Tayyip Erdogan, rayedarên AKP'ê bi vê nexweşiyê ketine. Ji bo partiyekê ji sedî 47 mîna xewnekê ye. Ji wê wêdetir bingeha desthilatiya yekpartiyî ava dibe, ji lew re jî xeternak e.

Lê Tayyip Erdogan rêjeya ji sedî sed wekî armanc daniye ber xwe. Ev mebesta AKP'ê herî baş bi pankarta "Padîşahê dawîn Tayyip Erdogan" diyar bû.

Me got ev çend azwerî ne tenê ji bo gel û civakê, ji bo xwediyê xwe jî xeternak e. Ev cure azwerî pirî caran serê xwediyê xwe dixwe.

Di dîroka siyasî ya Tirkiyeyê de mînaka herî berbiçav a vê azweriya desthilatiyê Adnan Menderes e. Gelên Tirkiyeyê ji bo ku ji desthilatiya yekpartîniyê rizgar bibin, bi rêjeyeke mezin DP anî ser kar, lê rayedarên vê partiyê li hemberî vê rewşê xwe winda kir.

Êdî bi hezar dek û dolaban wan xwest desthilatiya xwe mayinde bikin. Di encamê vê azweriya zêde serê Menderes û çend hevalên wî xwar.

Ne dûr e ku heman aqûbet were serê Tayyip Erdogan jî. Ji ber ku ew jî bi heman azweriyê tevdigere.

Doza Ergenekonê bi aliyekî xwe ber bi doza tolhildanê ve diçe. Hemû kesên ku bi awayekî di nav çalakiyên kemalîstan de cih girtine dibin armanca êrîşên polîsan. Li hemberî vê yekê fetullahî û alîgirên AKP'ê jî di nava saziyên dewletê de bi cih dikin, cihên xwe yên heyî qewîntir dikin.

AKP niha Ergenekona xwe ava dike. Lewre jî kîjan kes, sazî û derdorê ji xwe re wekî kelem û asteng dibîne berê xwe dide wan. Êrîşên dawîn ên li ser rêveberên DTP'ê jî nîşaneya vê yekê ye. AKP'ê di hilbijartinan de ji kurdan şimaqek xwar, niha dixwaze bi van girtinan tola xwe hilîne.

Azwerî û hestên tolhildanê aliyekî mijarê ronî dikin. Aliyê din nirxandineke kûrtir û berfirehtir dixwaze. Têkiliya van girtinan rasterast bi Konferansa Neteweyî re heye. Hêzên dagirker û hevalbendên wan ên navneteweyî naxwazin ku kurdên Bakur bi awayekî xurt û rêkxistî beşdarî konferansê bibin.

Armanca sereke ya van girtinan rênedana Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) e. Rêberê Gelê Kurd birêz Ocalan ev çend hefte ne dixwaze ku tevgera demokratîk a kurd li Amedê Kongreya Civaka Demokratîk bicivîne, amadekariya Konferansa Neteweyî li vir were kirin, heyeta ku dê biçe Başûr jî li KCD'ê diyar bibe.

Dagirker dixwazin rê li ber vê yekê bigirin.Armanceke din a van girtinan jî belavkirina pergala kurdan e. Tevgera Demokratîk a Kurd di van du salên dawîn de hewl dide ku pergala xwe ya demokratîk ava bike. Armanca vê xebatê pêkanîna pergala Kurdistana Xweser û Demokratîk e.

Hêzên dewletê bi van girtinan dixwazin rê li ber vê yekê bigirin û nehêlin ku kurd bibin xwediyê pergaleke xweser û demokratîk.

Lê divê rayedarên dewletê jî bizanin ku êdî tîr ji kevanê derketiye, têkoşîna demokratîk a kurdan êdî bûye tevgera bi milyonan kesî.

Têkoşîna demokratîk di nava civaka kurd de şax vedaye, êrîşên wiha rê li ber nayê girtin. Gelê kurd dê pergala xwe ya demokratîk ava bike û dewlet jî dê mecbûrî naskirin û pejirandina vê pergala demokratîk bibe.

www.arsivdiyar.org

Wezaret pirsgirêkên girtîgehan nabîne

Ligel çalakiyên girtiyan ên balê dikişînin ser zordariyan, serlêdanên saziyên mafên mirovan jî Wezareta Dadê ji rewşê memnûn e. Lê raporên ÎHD'ê rewşê zelaltir radixe ber çavan

Tedayî û zordariyên li girtîgehan her diçe zêde dibin. Ligel ku heta niha ji bo astengkirina van zordariyan gelek caran serî li dozgeriyan û Wezareta Dadê hatiye dayîn jî tu encam nehatine girtin. Wezareta Dadê di bersivên dide serlêdanan de girtîgehê wekî cihek bê pirsgirêk û her tiştî li gorî hiqûqê nîşan dide.

Ligel çalakiya girtiyan ên balê dikişînin ser van zordariyan, serlêdanên saziyên mafên mirovan jî Wezareta Dadê û dozgerî ji rewşê memnûn in. Lê raporên ÎHD'ê ku gelek girtî bi armanca pirsgirêkên wan bigihînin rayedaran serî lê didin, rewşê zelaltir radixe ber çavan. Heta niha gelek pirsgirêkên wekî tenduristiyê, mafên civakî û xizmên girtiyan rastî zordariyê tê û ji ber vê yekê jî ÎHD'ê serî li Wezareta Dadê da. Bes di bersiva hatî dayîn de tedawiya bi kelepçeyî, cezayên hucreyê, qedexekirina mafên civakî bi tevahî ji hêla Wezareta Dadê ve wekî pêkanînên li gorî rêziknameyê ne hatine nîşandan. Her wiha di bersiva Wezareta Dadê de girtîgeh wekî cihên bêpirsgirêk hatine nîşandan. Her wiha binpêkirinên li hemberî qedexekirina kurdî û nedayîna pirtûk, kovar û rojnameyan, xwestina pereyê tercumeyê jî wekî pêkanînên hiqûqî hatin nîşandan.

Dernaxin hevdîtinan

Komeleyê dîsa di 21'ê mijdara sala 2008'an de bi sedema ku li Girtîgeha Jinan a Karataş a Edeneyê girtiya bi navê Sevcan Atak "Hatiye tazîkirin, ev pêkanîna tazîkirinê li hemû girtiyan kirine, her wiha li ser zenda girtiyên derxistine hevdîtina vekirî hatiye xwestin ku mohra 'Yek al, yek ziman û yek welat' lê bixin. Girtiyên ku ev yek red kirine dernexistine hevdîtina vekirî" serî li Wezareta Dadê da.

Lê Midûrê Giştî yê Cezayê Malên Tevkîfê ev tişt red kirin. Li gorî agahiyên ji Serdozgeriya Komarê ya Edenê hat bidestxistin 'lêgerîna tazî ya li ser jinan' ne li gorî sazkirina zagonan e. Wezaretê jî diyar kir ku 'lêgerîna zirav' ya wekî lêgerîna li ser kûrahiyên laş de li gorî rêziknameyê ne. Wezaretê anî ziman ku îdiayên li ser zendê girtiyan "Yek al, ek ziman û yek welat" ne rast in û tiştekî wisa nehatiye nivîsandin.

Endamê Komîsyona Girtîgehan a ÎHD'a Edeneyê Osman Kara, der barê mijarê de diyar kir ku wan li ser serlêdana girtiyan di nava 3 mehan de gelek caran serî li Wezareta Dadê daye û heman bersiv girtine. Kara wiha got: "Li gorî bersivên em ji Wezaretê digirin tê xuyakirin ku der barê mijarê de bi girtiyan re hevdîtin pêk nehatiye. Bersiv li gorî agahiyên Midûr û Dozgerê Girtîgehê hatiye dayîn. Divê Wezareta Dadê pirsgirêkên li girtîgehê têne jiyandin bibîne." **EDENE**

Geylanî pirsgirêka girtiyan anîn rojeva Meclîsê

Parlamenterê DTP'ê yê Colemêrgê Hamît Geylanî pêkûtî û muameleyên xirab yên li ser girtiyên di girtîgehên Tirkiyeyê de tên girtin, anîn rojeva Meclîsê.

Parlameterê DTP'ê yê Colemêrgê Hamît Geylanî bi daxwaza bersivandina nivîskî ya Wezîrê Dadê Mehmet Alî Şahîn pirsniyarname da Meclîsê. Geylanî, diyar kir ku di van rojên dawî de li ser girtiyan pêkutî derketine asta herî bilind û girtî rastî pêkanînên kêfî yên rêveberiyîn girtîgehan tên. Geylanî, da zanîn ku herî dawiyê ji girtiyên siyasî yên li Girtîgeha Tîpa F a Hejmar 2 a Tekirdagê hin gilî girtine û ragihand ku girtî rastî pêkûtî û pêkanînên kêfî tên. Geylanî bi daxwaza bersivandina Wezîr Atalay ev pirs pirsîn:

✓ Der barê pêkûtî û muameleyên xerab yên li ser girtiyê di serî de Girtîgeha Tîpa F ya Hejmar 2, li hemû girtîgehên li Tirkiyeyê de agahiyên we hene?

✓ Hûn dê der heqê personel û rêveberên ku muameleya xerab li girtiyan dikin de lêpirsînê bidin vekirin?

✓ Di girtîgehan de axaftina kurdî qedexeye an na?" **ENQERE**

14 sal in kujer nehatine dîtin

Malbata Kadîr Keremoglu yê di sala 1995'an de li Wanê hate revandin ev 14 sal in li hêviyê ne ku qatil derkeve pêşberî dadgehê. Kurê Kadîr Keremoglu, Bahattîn Keremoglu, diyar kir ku endamê MÎT'ê Kurşat, bi riya Abdûlhekîm Ozdemîr ku li cem Waliyê Wanê yê wê demê Mahmût Yilbaş bi wî re hevdîtin çêkiriye û ji bo cenazeyê bavê wî 200 mark jê xwestiye.

Karsazê bi navê Kadîr Keremoglu ku di nîsana sala 1995'an de dema ji mizgeftê derdiket hate revandin 14 sal derbas bûn hîn tu agahî jê nayê stendin. Malbata Keremoglu diyar kir ku di dosyaya Sûsûrlukê de jî navê bavê wan derbas dibe û ji bo kujerê bavê wan bê dîtin ev 14 sal in serî li gelek cihan dane. Kurê Kadîr Keremoglû, Bahattîn Keremoglû diyar kir ku ji bo bavê wan bê dîtin wan serî li Midurê Polîsan ê Giştî Mehmet Agar, Parlamenterê Colemêrgê Mustafa Zeydan û gelek cihên din dane lê belê tu encam negirtine. Bahattîn Keremoglû daxuyand ku Mehmet Agar ji wan re gotiye wan Wekîlê Serokê Daîreya Tevgêra Taybet Îbrahîm Şahîn peywirdar kiriye lê tu agahî bi dest nexistine. Keremoglu, anî ziman ku 14 sal in bavê wî winda bûye û xwest ku qatîlê bavê wî bê dîtin û derkeve pêşberî dadgehê. Keremoglû, destnîşan kir ku ji bo kujerê bavê wî bê dîtin wî serî li Dozgeriya Ergenekonê daye û xwestiye bibe mudaxîlê doza Ergenekonê.

Bahattîn Keremoglû, da zanîn ku Mahmût Yildirim (Yeşîl) û Alaattîn Kanat ji birayê wî Senar Keremoglû pere xwestibûn, lê ji ber ku birayê wî pere nedabûn bavê wî hate revandin. Keremoglû wiha berdewam kir: "Qatîlê bavê min diyar in. Lê ev 14 sal in nayên dîtin. Endamê MÎT'ê yê bi navê Kurşat bi riya Abdûrrahman Ozdemîr ku li cem Waliyê Wanê Mahmût Yilbaş dixebitî bi min re hevdîtin çêkir. Di hevdîtinê de ji min 200 marq xwest û got 'Ez ê cenazeyê bavê te bînim'. Piştre me jî 30 hezar marq li buroya Abdûlhekîm Ozdemîr danî. Lê me tu encam negirt. Dema em bi şopê ketin gef li me xarin."

Keremoglû, anî ziman ku ew ê dozê bibin Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê. Kadîr Keremoglû, 14 sal berê li Navenda Wane ji aliyê kesên ku di texsiyên plaqeyên wan 01 EA 600 Toros, plaqeya wê 65 ER 279 Dogan plaqeya wê 06 SH 600 Broadway û plaqeya wê 34 ALL 82 ve di derketina mizgeftê de hat revandin. **COLEMÊRG**

ÎHD'î çalakiyên xwe didomînin

Çalakiya Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a bi dirûşma "Bila winda bên dîtin, kiryan bên darizandin" didome. Parêzvanên mafê mirovan vê hefteyê jî li Amed, Êlih, Îzmîr û Enqereyê çalakî li dar xistin.

Li Amedê ÎHD' li ber Abîdeya Mafê Jiyanê ya parka Koşuyoluyê ji bo kesên ku hatine windakirin çalakiya xwe ya 11'emîn li dar xist. ÎHD'ê çalakiya xwe ya vê hefteyê ji bo Abdulkadîr Kurt li dar xist. Keça Abdulkadîr Kurt, Mizgîn Kurt diyar kir ku ew 16 sal in bi hesreta ku bavê xwe hembêz bike dijî. Mizgîn Kurt got ku ew êdî mezin bûye û ji bo ku ji qatilan hesab bipirse li vir e.

ÎHD'a Amedê çalakiya xwe ya "Bila winda bên dîtin, kiryar bên darizandin" cara 11'emîn li dar xist. Rêveberên ÎHD'ê û malbatên kesên ku hatine windakirin tev li çalakiyê bûn. Sekreterê ÎHD'a Amedê Burhan Zorooglu di çalakiyê de axivî û got ku ji bo ku hestiyên kesên ku hatine windakirin bên dîtin têkoşîna xwe didomînin. Piştî axaftina Zorooglu keça Abdulkadîr Kurt ê ku di sala 1992'yan de hatiye windakirin axivî. Mizgîn Kurt di axaftina xwe de got ku ji bo ku ji kujerên bavê xwe hesab bipirse li vir e. Piştî axaftinan çalakiya rûniştinê pêk hat û girse belav bû.

Li Êlihê ÎHD'iyan li ber Abîdeya Mafê Mirovan a li cadeya Gulistanê çalakî li dar xist. Sekretera ÎHD'a Êlihê Salîha Astan di çalakiyê de axivî û got ku ji bo ku carake din cinayetên kiryarên wan ne diyar neqewimin û berpirsyar bên darizandin bila xizmên kesên winda serî li ÎHD'ê bidin.

Li Enqereyê jî li cadeya Yukselê daxuyaniyek hate dayîn. Di çalakiya wê hefteyê de jî aqûbeta Kenan Bîlgîn ê ku di sala 1994'an de hatibû windakirin hate pirsîn.

Di çalakiya Îzmîrê de jî parazvanên mafê mirovan û xizmên windayan li ser navê girseyê Evrîm Kubîlay daxuyanî da.

AMED / ÊLIH / ÎZMÎR / ENQERE

Parazvanên mafên mirovan û xizmên kesên ku hatine windakirin cara 11'emîn li Amed, Êlih, Îzmîr û Enqereyê çalakî li dar xistin. Di çalakiyan de aqûbeta kesên ku ji aliyê dewletê ve hatine windakirin hate pirsîn.

Li Berwariyê zarok tên kuştin!

Li navçeya Xisxê ya Sêrtê di nav 10 rojan de 4 zarok winda bûn û cenazeyê 2 zarokan hatin dîtin.

Li navçeya Xisxê (Berwarî) ya Sêrtê di 5'ê nîsanê de Esma Selçûk (2) û Kadîr Adiguzel (4) winda bûn. Esma Selçûk di bîreke avê de li ber mirinê hate dîtin. Kadîr Adiguzel jî di heman bîrê de mirî hate dîtin. Piştî van her du bûyeran di 14'ê nîsanê de Ahmet Selçuk (2) dema li ber deriyê xwe dilîst winda bû û rojek piştre 2 kîlometre dûrî malê li qadeke vala hate dîtin û rakirin nexweşxaneyê. Herî dawî di 15'ê nîsanê de saet di 18.00'an de Aysel Selçûk (4) winda bû 2 saet piştre li bîra avê ya li nêzîk Dibistana Leylî ya Herêmê (YÎBO) a bi navê 'Kaniya Mihendisan' mirî hate dîtin. Hate ragihandin ku ji ber van bûyeran malbat bi fikar in. **SÊRT**

Li Nordizê operasyon

Li herêma Nordizê ya bi ser navçeya Payizavaya Wanê, operasyoneke leşkerî ya berfireh didome.

Piştî biryara KCK'ê ya bêçalaktiyê ya heta 1'ê hezîranê operasyonên li herêmê zêde dibin.

Li herêma Nordiza bi ser navçeya Payîzavayê, bi beşdariya cerdevanan operasyoneke leşkerî ya berfireh hatiye destpêkirin. Operasyona ku hêj didome, leşker şivan û gundiyên ku ji bo çêrandinê sewalên xwe derdixin zozanan asteng dikin.

Şivanên ku pezên xwe derdixin çêrê û tên vegerandin, ji ber operasyonê di nav fikaran de ne. **WAN**

www.kurdiyakuroj.com

Li Amedê 51 DTP'î hatin girtin

Duh li Amedê di nav de du cîgirên hevserokên DTP'ê jî heyî 20 jê endamên MYK'a partiyê 51 DTP'î hatin girtin. Hevseroka DTP'ê anî ziman ku pirsên sosret ji rayedarên partiyê hatine kirin. MAZLUMDER'ê ragihand ku 245 binçavkirin û 83 girtin pêk hatine

Li Amedê ji 53 kesên di çarçoveya operasyona li dijî DTP'ê hevdemî li 15 bajarên wekî Amed, Îzmîr, Şirnex, Mêrdîn, Êlih, Dêrsim, Stenbol, Enqere Aydin û Edeneyê bi talîmata Serdozgeriya Komarê ya Amedê hatibûn pêkanîn de hatibûn binçavkirin 51 kes bi hinceta "Rêveber û endamên rêxistinê ne" hatin girtin. 2 kes jî serbest hatin berdan. Li navçeya Norşînê ya Bedlîsê ji kesên di encama serdagirtinên malan hatibûn binçavkirin 5 kes bi hinceta di mitînga DTP'ê de "Sloganên derqanûnî" avêtine hatin girtin.

Dozger xwest gel bixapîne

Pêr ku li tevahiya Amedê esnafan darabeyên dikanên xwe venekiribûn û bi hezaran kes li ber Edliyeya Amedê civiyabûn, Serdozgeriya Komarê ya Amedê bi hîle dest bi girtina îfadeyan kir. Serdozgeriyê beriya nîvro ragihand ku, li ser daxwaza polîsan rojeke din dem daye ku DTP'î binçavkirî bimînin. Lê piştî nîvro ji saet 14.30'ê şûn de DTP'î derxistin dozgeriyê.

'Koma Awazên Çiya'...

Di saetên ku DTP'î dianîn dozgeriyê de li ber avahiyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê bi hezaran kes civiyabûn û li ber stranên Koma Awazên Çiya govend girêdabû. Girseya ku li vir civiyabû bi dirûşmên xwe dengê xwe digihand hundirê Edliyeya Amedê. Di vê navberê de polîsan ji DTP'iyan xwest ku strana Oramarê neyê lêxistin. Lê tu kesê polîs guhdarî nekirin û stranên Oremar û Destana Zapê bênavber di otobûsa DTP'ê de li ber şaredariyê hatibû rawestandin hate lêxistin.

Li ber edliyeyê nobet...

Di nav de Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna, Parlamenterên DTP'ê Selahattîn Demîrtaş, Bengî Yildiz, Hamît Geylanî, Hasîp Kaplan, Aysel Tugluk, Şaredarên DTP'ê, nûnerên saziyên sivîl, hiqûqnas û gelek nivîskar û rewşenbîr, malbatên DTP'iyên di binçavan de ji pêr serê sibê heta duh dayîna îfadeyan bi dawî bûn li ber avahiyê edliyeyê sekinîn.

Dîmena dagirkeriyê...

Di vê navberê de dîmena li ber edliye û şaredariyê xwe daye der, rastiya dozê jî vedigot. Polîsan bi panzer û dûpişk û çekên giran dora avahiya edliyeyê dorpêç kiribû. Li ber Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê jî stran û dirûşmên ji bo azadiyê dihatin qêrîn. Dîmen tabloya rastiya dagirkeriya dewleta tirk a li Kurdistanê nîşan dide.

Polîsan bi ser GKM'ê de girt

Polîsan duh bi şev bi ser Navenda Çandê ya Ciwanan (GKM) de girt. Di çarçoveya operasyona li dijî DTP'ê hatî destpêkirin de şevê din yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Stenbolê bi ser Navenda Çandê ya Ciwanan a li Kolana Îstîklalê de girt. Di encama serdagirtina şevê din de bi saetan li avahiya navendê lêgerîn pêk hat. Di serdagirtina bêyî agahiya endamên GKM'ê pêk hatî de polîsan dest danî ser hin ewraqan. STENBOL

51 kes hatine girtin

Ji 53 kes piştî îfadeya li Dozgeriya Komarê ya Amedê bi daxwaza girtinê sewqî Dadgeha Nobedar hatin kirin. Li vir piştî îfadeyan cîgirên hevserokên DTP'ê Kamuran Yuksek, Bayram Altun, Mustafa Sarikaya, Endamê PM'ya DTP'ê Selma Irmak, Prz. Şînasî Tur, Prz. Ebru Gunay, Prz. Siracettîn Irmak, Huseyîn Yilmaz, Kemal Aktaş, Mehmet Abbasoglu, Herdem Kizilkaya, Mehmet Akin, Celal Yoldaş, Hasan Înatçi, Sara Aktaş, Ercan Sezgîn, Nadîr Yildirim, Rêveberê DTP'a Amedê yê berê Musa Farîsogullari, Temer Tanrikulu, Koordînatorê Giştî yê Gun TV'yê Ahmet Bîrsîn, Zehra Bozaci, Zahîde Besî, Çîmen Işik, Heval Erdemlî, Perguzar Kaygusuz, Ahmet Çelen, Alîcan Onlu, Salîh Akdogan, Besîme Konca, Elîf Kaya, Leyla Denîz, Mazlum Tekdag, Olcay Kanlibaş, Pero Dundar, Pinar Işik, Sêvê Demîr, Zeynep Boga, Ahmet Zîrek, Nîhayet Taşdemir, Dîlan Taşdemîr, Esma Guler, Gulcîhan Şîmşek, Hasan Uner, Musa Çîftçî, Aslan Ozdemîr, Engîn Kotay, Mehmet Nîmet Sevîm, Rahmî Ozmen, Roza Erdede, Hasan Iraz, Lutfu Dag û Senanîk Oner bi hinceta "Rêveberên rêxistinê ne" û "Endamê rêxistinê ne" hatin girtin. Kesên hatine girtin şandin Girtîgeha Tîpa D a Amedê.

Bi vî awayî ji 53 DTP'iyan tenê Umît Aydin, Mesut Çetîn hatin berdan û bi tevahî 51 DTP'î jî hatin girtin.

5 kes jî li Norşînê hatin girtin

Li Norşînê ya Bedlîsê ji 20 kesên di encama serdagirtinên malan yên ji aliyê ekîbên Midûriyeta Polîsan a Navçeyê ve hatine pêkanîn de duh hatibûn binçavkirin 11 kes piştî muameleyên li midûriyeta polîsan hatin berdan û 9 kesên din jî sewqî dozgeriyê hatin kirin. Di piştî li dozgeriyê îfadeyên wan hatin girtin ji 9 kesan 5 kesên bi navê Burhan Tunç, Necmettîn Akkur, Bariş Çetîn, Şîfa Yaktin, Eyup Tekîn bi daxwaza girtginê sewqî Dadgeha Sulh Ceza ya Norşînê hatin kirin. Dadgehê jî bi hinceta di mitînga DTP'ê de "Sloganên derzagonî" avêtine ew girtin û şandin Girtîgeha Tîpa E ya Bedlîsê. Her wiha hate zanîn, Eyup Tekîn ku hatiye girtin ji piyê xwe seqet e û raporo wî ya 'Sedî 62 seqet e' heye. AMED / BEDLÎS

'Êrîş li dijî pergala me ya demokratîk pêk hatiye'

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna anî ziman ku tu bingehê hiqûqê yê zext û zora li hemberî partiya wan tên meşandin nîn in û diyar kir ku armanca êrîşan siyasî ye. Ayna got; 'me der barê dozgerên ku di binçavkirinan de bêhiqûqî kiriye û yên der barê partiya me de nûçeyên derew weşandine de gilî bikin. Aynayê got ku, 'dozgeran li hemberî pergala DTP'ê ya demokratîk ev operasyon pêk aniye'.

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna û parlamanterên DTP'ê civîneke çapemeniyê der barê operasyona li 15 bajaran li hemberî partiya wan pêk hatiye de pêk anî.

Ayna di civîna çapemeniyê de axivî û anî ziman ku bêyî sedemek hebe rêveber û endamên partiya wan hatine girtin û diyar kir ku ev êrîş bi hincetên siyasî pêk hatine.

Ayna di axaftina xwe de ku piranî caran ji ber dirûşmên 'Bijî Serok Apo' û 'Zext me têk nabin' hate qutkirin, anî ziman ku pirsên sosret ji rêveberên partiya wan hatine kirin. Aynayê wiha dirêjî da gotinên xwe: "Dozger dibêjin; 'li falan bajar, navçe yan jî bajarokî erkdariyeke çawa daye ber parlamenterên xwe?', 'we li vî bajarî, li vê navçeyê namzetên xwe yên ji bo şaredariyê li gorî kîjan krîteran hilbijartin?' Bifikirin ku ev pirs ji endamê meclîsa partiyê tê kirin. Dibêjin, 'di dema hilbijartinê de ji bo destnîşankirina namzetan we erkdariyeke çawa girtiye?' Ev pirs tên kirin. Ev pirs ji kesên ku partiya me belgeya erkdariyê jê re daye û di heman demê de erkdariya ji Lijneya Hilbijartinê ya Bilind re hatiye ragihandin. Mejiyê hiqûqa li gorî pergala yekdestiyê teşe girtiye tevlihev bûye. Partiyên din komîsyonên hilbijartinê pêk naynin. Em di nava xwe de hewl didin ku pergala demokratîk pêk bînin. Operasyon li hemberî vê pergala me pêk hatiye."

Aynayê derbirî ku ew ê li hemberî bêhiqûqiya ku li dijî partiya wan pêk hatiye hemû mafên xwe yên demokratîk pêk bînin û wiha got: "Yên ku nûçeyên derew der barê partiya me de weşandine, dozgeran agahiyên derew dane ragihandin, bêhiqûqiya di binçavan de pêk hatiye em ê gilî bikin. Em ê der barê dozgerên bûne sedemê vê bêhiqûqiyê de jî gilî bikin." AMED

Însiyatîfa Gel: Gulen û AKP'ê rê li ber êrîşan vekir

Însiyatîfa Gel a Kurdistanê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku cemaeta Gulen û Hikûmeta AKP'ê dê di bin operasyona li hemberî gelê kurd daye destpêkirin de bimînin. Însiyatîfa Gel ragihand ku ji niha şûnde li Kurdistanê û metropolên Tirkiyeyê saziyên aydê Cemaeta Gulen û rêveberên AKP'ê di hedefa wan de ne. Însiyatîfa Gel di daxuyaniya xwe de wiha got: "Her wekî tê zanîn AKP û aqildarê wê Fetullah Gulen nûnerên gelê kurd ên DTP'î û nûnerên saziyên kurd ji bo xwe kirine hedef, fûryaya binçavkirinan daye destpêkirin û bi îdiayên derew dane girtin. Em wekî Însiyatîfa Gel a Kurdistanê sedema vê operasyonê baş dizanin. Fermana ji bo vê operasyonê ji aliyê Serokwezîrê Dewleta Tirk Recep Tayyîp Erdogan û aqildarê wî Fetullah Gulen ve hatiye dayîn. Hêzên polîsan ên girêdayî xwe bi mebesta tolhildanê berê DTP'ê û gelê kurd kirine."

Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku bersiva gel a li hemberî dek û dolabên gemarî dê hebe û wiha hate gotin: "Ji niha şûnde tu rayedarên AKP'ê dê nikaribin bi rehetî li Kurdistanê bigerin û faaliyetên xwe pêk bînin. Ev hêz dê nikaribin rehet nefesê bigirin." Di daxuyaniyê de banga piştgiriya ji bo DTP'ê jî li gelê kurd hate kirin. AMED / ANF

'Dê bibin sedema înfîaleke civakî'

Zext û zorên li ser DTP'ê li Enqere, Amed, Mêrsîn, Çewlik, Meletî, Wan, Sêrt, Elezîz, Denîzlî, Manîsa, Stenbol û gelek bajarên din hate şermezarkirin. Di çalakî û daxuyaniyan de hate destnîşankirin ku heke dewlet dest ji van zextan bernede dê bibe sedemê înfaleke civakî.

Li Amedê Partiya Sosyalîst, Partiya Demokrasiya Sosyalîst, Partiya Tevgera Kedkar, Hewldana Partiya Tevgera Kedkar a Sosyalîst û Platforma Azadîxwaz a Civakî bi daxuyaniyekê piştgirî da DTP'ê. Serokê Giştî yê Partiya Sosyalîst Mustafa Kayha daxuyaniya çapemeniyê xwend û anî ziman ku plana tasfiyeyê ji bo kurdan di dewrê de ye.

245 binçavkirin 83 girtin

Her wiha li Amedê MAZLUMDER'ê jî bi daxuyaniyeke çapemenî êrîşên li hemberî DTP'ê şermezar kirin. Serokê MAZLUMDER'a Amedê parêzêr Selahattîn Çoban diyar kir ku di nava 4 rojan de 245 DTP'î hatiye binçavkirin û ji wan 83 jê hatine girtin. Çoban tabloya heyî wekî bêhiqûqiyê nav kir û got: "Li vir bi awayekî aşkera mafên mirovan hatine binpêkirin."

Li Meletiyê jî partiyên siyasî û rêxistinên sivîl li ber avahiya Postexaneya Mezin daxuyaniyek da çapemeniyê. DTP'a Mêrsînê jî li ber avahiya partiyê daxuyaniyek da çapemeniyê. Gelek saziyên sivîl, şaredar û rayedarên partiyê tevlî daxuyaniyê bûn.

Li bajarên Tirkiyeyê yên wekî Îzmîr, Denîzlî, Manîsa û Stenbolê jî duh çalakiyên şermezarkirina operasyona li hemberî DTP'ê û girtina DTP'iyan hatin lidarxistin. Her wiha Serokê SODEV'ê Erol Kizilelma û anî ziman ku ev operasyon nîşan dide hikûmet li hemberî nêrînên cuda xwedî tehamûleke demokratîk nîn e.

Platforma Jinan a Enqereyê li ber Abîdeya Mafên Mirovan a li cadeya Yukselê daxuyaniyek da çapemeniyê. Li ser navê platformê Yeşîm Ergul daxuyanî xwend û anî ziman ku teslîmgirtina îradeya gelê kurd tê xwestin. Serokê Kurd-Der'ê Ahmet Aday der barê mijarê de daxuyaniyek da çapemeniyê û operasyona li hemberî DTP'ê wekî operasyoneke derhiqûqî nav kir. Aday di daxuyaniya xwe de bi bîr xist ku di operasyonê de rayedarên DTP'ê hatine girtin.

Li Serhedê nerazîbûn

Li Wan, Sêrt, Çewlik û Elezîzê jî duh çalakî hebûn. Serokê Koordînasyona Bajar a TMMOB'ê Şevket Akdemîr daxuyaniyeke nivîskî weşand. Li ber avahiya DTP'a Sêrtê jî bi beşdariya saziyên sivîl, rayedar û şaredarên DTP'ê daxuyaniyek hate dayîn. Li Kercewsê jî bi beşdariya Serokê DTP'a Sêrtê Abdurrahman Taşçî daxuyaniyeke girseyî hate dayîn. DTP'a Elezîzê li ber garaja Hozatê daxuyaniyek da çapemeniyê. Li Çewlikê jî ÎHD'ê daxuyaniyek ji bo şermezarkirina operasyona li hemberî DTP'ê û girtina DTP'iyan da.

NAVENDA NÛÇEYAN AMED

www.arsivkurdi.org

Ji PJAK'ê 14 xalên çareseriyê

PJAK'ê li Îranê di pêvajoya hilbijartinên serokomariyê de ji bo civakeke azad û demokratîk pakêteke ku ji 14 xalan pêk tê aşkera kir. PJAK'ê daxuyand ku kesên van daxwazan qebûl bikin dê piştgiriya wan bikin û ji bo çareseriya pirsgirêkan çareya herî maqûl konfederalîzma demokratîk e

Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) li Îranê beriya hilbijartinên serokomariyê ji bo çareseriyê pakêteke ji 14 xalan pêk tê aşkera kirin û destnîşan kirin ku namzetên ku van daxwazan qebûl bikin dê piştgiriya wan bikin. Di 14 xalên PJAK'ê de hêmanên bingehîn ên civakeke demokratîk û azad hene.

PJAK'ê daxuyand ku rejîma Îranê weke berê nikare heyîna xwe berdewam bike û ji bo çareseriya pirsgirêkên li Îranê çareya herî baş konfederalîzma demokratîk e. PJAK'ê, diyar kir ku bi salan e li Îranê gelên weke fars, kurd, azerî, belûcî û ereb pêkve jiyan e, lê niha ji aliyê dewleta navendî ve nayên naskirin.

Herêma mahrûmiyetê

PJAK'ê destnîşan kir ku bi têkoşîneke hevpar a gelan şoreşek li Îranê pêk hat û wiha got: "Komara Îslamî ya Îranê bi navê azadî û nasîna mafên gelên din hate ser desthilatdariyê. Lê rejîma Îranê nebû nûnerê daxwaza azadiya gelan. Piştre şoreş kete bin kontrola mezhebekê an jî îdeolojiyekê. Li ser beşên din, gel, nêrînên siyasî û mezhebên cuda pekutî zêde kirin. Ji bo hilbijartinên serokomariyê her çiqas vegotinên cuda û nêrînên lîberal bêne ziman jî nikarin îdeolojiya heyî li paş xwe bihêlin. Kesên bi navê reformîst derdikevin jî piştre dibin berdevkên herî mezin ê vê sîstemê. Bi taybetî li Kurdistanê sloganên cudê bêne gotin jî, bêjin em li hemberî nebaşiyan şer dikin jî, Kurdistan kirine herêmeke mahrûmiyetê. Di polîtîkaya înkar û îmhayê de dewlet û hikûmet di nava polîtîkayeke hevpar de ne."

Di ser qanûnan re sazî hene

PJAK'ê daxuyand ku di ser qanûnan re sazî hene û wiha got: "Kesên ku weke namzet beşdarî hilbijartinên Îranê dibin parêzvan û berdevkên sîstemê ne. Kesên cuda ku bixwazin bibin namzet têne astengkirin. Ev yek jî nahêle ku gelek bi îradeya xwe pêşeroja xwe tayîn bike. Îdeolojiya heyî ya li Îranê pirsgirêkên heyî zêdetir kiriye, azadî ji holê rakiriye û li pêşiya çanda gel dibin asteng."

PJAK'ê diyar kir ku daxwazên azadiyê yên gelan bi rêbazên şîdetê têne bersivandin û wiha got: "PJAK ji bo daxwazên demokratîk ên gelan û afirandina derfetên bi hev re têkoşîna xwe didomîne. Heke hilbijartin di hawireke azad de pêk bê, dê PJAK vê hilbijartinê meşûr bibîne. PJAK li Îranê ji bo çareseriya pirsgirêkan konfederalîzma demokratîk weke riya herî maqûl dibîne û li ser vî esasî li Îran û rojhilatê Kurdistanê têkoşînê dide."

AZÎZ KOYLUOGLU QENDÎL / ANF

14 xalên daxwaza azadî û demokrasiyê

PJAK di vê çarçoveyê de di pêvajoya hilbijartinê de daxwazên xwe wiha rêz dike:

1- Li Îranê ji bo çareseriya siyasî ya hemû nasnameyên etnîk, siyasî, ekonomîk, çandî mezhebî, ziman û ji hemûyan girîngtir pirsgirêka kurd a siyasî divê bê hedefkirin

2- Ji bo gelê kurd û gelên din xweseriya demokratîk û pêkhatina hemû cureyên ewlehiya bi qanûnî

3- Ji bo hemû rêxistinên siyasî, mezheban û ji bo fikir xwe bi awayekî azad îfade bikin guhartinên makeqanûnî divê pêk bên

4- Ji bo azadiya ramanê rakirina qedexeyên siyasî, rakirina bidarvekirinê, rakirina her cure îşkenceyên fikrî û fizikî, rakirina pêkanîna recm û qistasa bi qistas

5- Pêkanîna xala 15'emîn (Mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê) a di makeqanûnê de

6- Pratîkirina qanûnên navneteweyî û avakirina wezareta mafên mirovan

7- Qedexekirina çêkên îmhayê yên girseyî û li Îran û cîhanê qedexekirina çekên nukleerî

8- Ji bo ciwan û jin bi awayekî aktîf karibin tevli jiyana siyasî û ekonomîk bibin derfet bêne afirandin, bi taybetî ji bo jinan nêzîkatiyek pozîtîf bê nîşandan

9- Avakirina hiqûqa hemwelatiyê, parastina mafên takekesî û bi awayekî azad mezheb heyîna xwe bidomînin

10- Azadiya çapemeniyê bi qanûnan ewlehiya wê bê misogerkirin û rakirina her cureyên sansûrê, amadekirina qanûna çapemeniyê ya azad û demokratîk

11- Di nava civakê de saziyên dewletê ku weke navgîna pekutî û tirsê tê bikaranîn bêne girtin

12- Li herêma Kurdistanê razemeniyên aboriyê bêne pêşxistin

13- Nêzîkatiyên negatîf ên ji bo ketina zanîngehê an jî karekî bê rakirin û ji bo beşên etnîkî yên din nêzîkatiyeke pozîtîf bê bipêxistin

14- Di makeqanûnê de guhartin bê çêkirin, saziyên ku ne di nava makeqanûnê de ne bêne rakirin

Mazhar Bagli: Kurdan bi rêxistina eşîrkî heta niha nasnameya xwe parastiye

Endamê Hîndekariyê yê Beşa Civaknasiyê ya Zanîngeha Dîcleyê, Doç. Dr. Mazhar Bagli, îdia kir ku kurdan di çarçoveya rêxistina eşîrî de li hemberî êrîşên derveyî xwe parastine û nasnameya xwe heta îro aniye.

Zanîngeha Dîcleyê, li Salona Konferansê ya Zankoya Tibê bi mijara, "Ji herêmî heta modernîzmê eşîr" panelek pêk anî. Di panelê de Hîndekarê Zanîngehê Dicleyê Alk. Doç. Mehmet Salîl Erpolat, Alk. Doç. Serkan Sari, Dr. Metin Gultekin û Doç. Dr. Mazhar Bagli axivîn. Alk. Doç. Mehmet Salîh Erpolat li ser rewşa eşîrên Amedê yên serdema sedsala 16'emîn axivî û anî ziman ku wê demê hemû eşîrên li herêmê debara xwe bi rêncberî û sewalkeriyê kirine. Erpolat, destnîşan kir ku wê demê eşîr her tim di nava koçeriyê de bûne û zivistanê li Amed û havînan jî çûne Torosan. Erpolat, bal kişand ser têkiliya eşîrên kurdan û dewleta Osmanî jî û wiha got: "Eşîrên herêmê ji bo osmanî tenê çavkaniya aboriyê bû. Her wiha çavkaniya leşkerî bû jî. Osmanî jî bi nasnameya olî nêzîkî eşîran dibû."

Doç. Dr. Mazhar Bagli

Hîndekarê Beşa Civaknasiyê ya Zanîngeha Dicleyê Civaknas Dr. Metin Gultekin jî li ser rewşa eşîran ya civakî rawestiya û anî ziman ku bêtir kurd bi rêxistinkirina eşîrtiyê têne naskirin. Gultekin, destnîşan kir ku eşîrên kurdan zêdetir li ser bingeha civakî hatine avakirin û sedema wan wiha vegot: "Li ser vê axê gelek dewletên mezin û şaristan hatin û çûn. Dewlet û şaristaniyan her tim xwest li ser welatiyên herêmê serdestiyê bimeşîne. Kurdan jî ji bo xwe li hemberî van serdestan biparêzin, xwe di warê eşîrtiyê de bi rêxistin kirin. Di rêxistina eşîrtiyê de têkiliyên malbatî pir xurt e. Dema ku mirov li herêmê dihere ji sedî 50 zewac di nava dotmam û pismam de çêbûye."

'Eşîrtiyê nasname parastiye'

Hîndekarê Beşa Civaknasiyê ya Zanîngeha Dîcleyê Doç. Dr. Mazhar Bagli jî li ser modernîzmê rawestiya û anî ziman ku her kes eşîrtiyê wekî bingeha xirabiyan dibîne û divê wisa neyê fêmkirin. Bagli diyar kir ku aliyên eşîrtiyê yên baş jî hene û yên xerab jî hene. Bagli wiha domand: "Her tim dewletê xwestiye ji navendê de mudaxaleyî rêxistina eşîrtiyê bike, lê belê êşîran jî ji bo dab û edetên xwe biparêze her tim rêxistina navxweyî xurtir kiriye. Her tim civaka eşîrê xwestiye xwe li hemberî polîtîkayên derve biparêze. Her çiqas dibêje pergalek feodal heye jî ez beşdarî vê yekê nabim. Rêxistineke xwezayî û civakî pêş ketiye. Ev yek nayê wateya ku ez hemû aliyê eşîrtiyê diparêzim. Rêxistina eşîrtiyê nasnameya kurdan heta niha parastiye." AMED / DÎHA

Erkmen dê ji ber Komkujiya Basayê îfade bide

Hate derbirîn ku Wezîrê Dewletê û Berpisyarê Mafên Mirovan ê demê Adnan Erkmen ku gotibû 'JÎTEM'ê Komkujiya Basayê ya di sala 1996'an de kiriye' dê îfadeyê bide.

Li bajaroka Basaya Şirnexê di sala 1996'an de di wesayîtek hatî şewitandin de 11 gundî hatibûn şewitandin û bêyî lêkolînek bê kirin dewletê bûyer avêtibû ser PKK'ê. PKK'ê jî bûyer qebûl nekiribû û daxuyandibû ku dewletê kiriye. Lê piştî 13 salan Wezîrê Dewletê û Berpisyarê Mafên Mirovan yê wê demê Adnan Erkmen, di daxuyaniyekê de gotibû "Komkujî ne ji aliyê PKK'ê ve ji aliyê JÎTEM'ê ve hatiye kirin". Serdozgeriya Komarê ya Amedê ku ji nû ve dosya vekir, delîlan berhev dike. Çav li rê ye ku dozger têkildarî mijarê serî li îfadeya Erkmen bide. Her wiha hate diyarkirin ku dozger di çarçoveya lêkolînê de xebata tespîtkirina agahiyên nasnameyê peywirdarên leşkerî yên wê demê li Basayê peywirdar bûne daye destpêkirin. AMED

Teşîrês

Mizgîn Bîngol
bingolmizgin@gmail.com

DTP bi ser ket dewlet har bû

Li Tirkiyeyê muxalefet, klîka demokrasiyê her wiha yên ku mora xwe li rengê Tirkiyeyê bixin kurd in. Ji ber wê hêza kurdan nîn e ku, wekî gurê devbixwîn û har, li dûv hilbijartina ku bi serkeftina kurdan bi encam bû êrîşî kurdan dikin.

Herî dawî bi dehan hevalên me! Endamên DTP'ê polisên tirk di berbangê sibê de girtin binçavan û avêtin zindanan. Di kesayetiya AKP'ê de dewleta tirk dixwaze dengên kurdan terorîze bike. Di qada navneteweyî de dengên kurdan berz bû dixwazin rengê grub an jî teroristbûnê bidin kurdan. Êrîşa Amara, serdagirtina DTP'ê, girtina Azadiya Welat û her wisa dixuyê ew ê êrîş pêl bi pêl berdewam bikin.

Wisa dixuyê Tirkiye ji hatina Obama pişt girtiye, lê divê neyê jibîrkirin siyaseta Amerîkayê li ser 'her aliyekî pariyekî bavêje ber dimeşe'.

Ez bi rastî naxwazim ji tirkan re behsa nirxên mafên mirovan bikim. Mirovatiya tirkan bi jêkirina guhên gerîlayan, bi birên qatlîaman û her wiha bi îşkenceyan hatiye pejirandin. Em li bendê ne ji bo qetlîamên gelê kurd, asûrî, rûm pontûs şerm bikin, bi ser de dîrokê tekerûr dikin, wekî dema 'Îstîklal Mahkemesî' bi nîvêşevê DTP'iyan davêjin zindanan.

Gotineke kurdan heye dibêje; 'ev lêlê ye hîna lolo jî maye'. Ew ê qirêjî bênirx û bêbextiyên bi komplo û buxtanan bi riya çapemeniya xwe ya qirêj nîşan bidin.

Kîjan hikûmet, kîjan rejîm desthilatdar be ferq nake, her dem kesên ku dikarin bibin mêjiyên kurdan hedef digirin. Berê bi faîlên wan nediyar (pir aşkera) dikuştin îro wan davêjin zindanan an jî digirin binçavan. Hevalê me Tayyip Temel di nivîsa xwe ya di roja 16 nîsanê de mînakek xweş dida. Digot 'di nava xelkê de çîrokek heye, dema kerek di cihekî re derbaz bibe û bûyereke nexweş bê serê wî, tu carî careke din di wir re derbas nabe' Bi rastî ev mînak pir li van binçavgirtinên dawî yên dewleta tirk tên. Dewleta tirk ji kerekî zêdetir ker e! Heger wisa nebûya têkoşîneke nêzî 30 salî li holê ye, bi qatlîam, bi revandin, bi binçavkirinan hîn xilas nekiriye û ew ê tu carî jî xilas nebe. Di ser de kurdan nifşên şer mezin kirine. Zarokên ku bi şer mezin bûne îro parêzerên vê têkoşînê ne. Bi TRT şeşan, rojnameyên kurdî û kurdolojiyan nikare kurdan bixapîne û bersiva xwe jî di hilbijartina 29'ê adara 2009'ê de pir baş ji gel wergirt.

Tiştê ku destê tirkan tê divê van hevalan bêşert û merc serbest berdin. Heger sebra gelê kurd biqede ew ê Enqere bi ber lingan here û Stenbol bibe ji topek ji agir. Dem hîn dereng nebûye divê gavên demokrasiyê bavêjin û fêrî encamên ku tevgerên demokrasî de derdikevin holê bibin. Bi hemû hoviya dewleta tirk, destên kurdan ên aştiyê li hewa maye…

Dewlet bi hewldanên dawî bivir li lingên xwe dixe. Heger armanc pasîfizebûna hêza kurd be, kurd berê wekî nêrîn ji hevdu nêzîk bûn îro bi awayekî hestyarî bi hev re hatine girêdan/bên girêdan.

Wekî kurd! Hewcetiya têkoşîna gelê kurd li ku hebe divê em li wir bin. Heger ev tiştên ku van hevalên me kirine 'sûc' bin me hemûyan ew sûc kiriye.

Nijadperestiya tirkan dikin

Li Lîseya Hulya Bajar a gundê Bejûha Qilabana Şirnexê mufretadeteke perwerdehiyê ya cuda tê bikaranîn. Piştî îdiaya ku xwendekarên lîseyê bi boneya ji bo konvoya DTP'ê nîşaneya serkeftinê kirine, rastî lêdanê hatine, niha jî hate angaştin ku mamoste ji xwendekaran re propagandaya nijadperestiyê dike. Hate angaştin ku mamoste zorê li xwendekaran dikin ku dîziyan temaşe bikin û xwendekarên diziyan temaşe nakin rastî lêdanê tên. Xwendekaran diyar kir ku dema dereng dimînin jî mamoste wan dibe ber peykerê Ataturk û ji wan dixwaze ku lêborîna xwe jê bixwazin. ŞIRNEX / DÎHA

www.arsivakurdi.org

‘Me sozê girtina Roj Tv’ê nedaye’

Tirkiyeyê di civîna NATO’yê ya Strazbourgê de di bedêla erêkirina Sekreteriya Giştî ya NATO’yê de ji Danîmarkayê xwest ku Roj TV’ê bigire. Lê Sefîrê Danîmarkayê yê Enqereyê Vahr got ku ew sozeke wisa nikarin bidin hin kesan

Sefîrê mezin ê Danîmarkayê yê Enqereyê Jesper Vahr got ku di bedêla Sekreteriya Giştî ya NATO’yê de wan sozê girtina Roj TV’ê nedaye û agahiyên ku di vê der barê de derketine derew in.

Sefîrê Mezin ê Danîmarkayê yê Enqereyê Vahr destnîşan kir ku heta Roj Tv di nav çarçoveya qanûnên Danîmarkayê de weşanê bike dê lîsansa wê neyê betalkirin.

Vê agahiyê di weşana Tirkiyeyê de jî cih girt. Jesper Vahr di agahiyên da weşanên tirk de vegot ku ‘Roj-Tv bi lîsansa Danîmarkayê weşanê dike. Di armanca dayîna lîsansê de gelek sedemên teknîkî û rêveberî hene. Wek hemû lîsansên din ên di vê lîsansê de jî armanc yek e. Ev nayê vê wateyê ku Danîmarka weşana ku lîsans daye wê tercîh dike û piştgiriya weşana wê dike. Wek hemû TV’ên din TV’ a ROJ jî mecbûr e ku li gorî qanûnên Danîmarkayê tevbigere û weşanê bike. Heta ku li gorî van qanûnan tevgeriya û weşan kir hikûmet nikare vê lîsansê betal bike.

Sefîr diyar kir ku li Danîmarkayê der barê Roj TV’ê de lêpirsînek heye û ew didome. Ev ne biryareke siyasiye. Dayina vê biryarê, dayîna biryara vekirina dozê li Danîmarkayê tenê erkek kare bide. Ew erk jî dozgeriye. Ji ber vê jî kes nikare bêje ev biryar siyasiye. Ji bo ku mirov karibe bêje Roj TV’ê qanûnên Danîmarkayê binpê kiriye divê delîl hebin. Heke delîlên binpêkirinê hebin û bên pêşkêşkirin, dadgeh van delîlan di cih de bibîne dê biryar bide û lîsans li gorî vê dê bê girtin. Der barê doza ku vebûye de jî ne hikûmeta Danîmarkayê û ne jî rayedarekî erkdar ê Danîmarkayê xwedî hêz e ku li ser dadgehê zextê bikin û bi dadgehê biryarên neqanûnî bidin girtin.”

Li ser pirsa ‘dê Roj TV bê girtin’ jî got ku ev tasarûf ne di bin destê kesî de ye û ji ber vê jî kes nikare li Danîmarkayê van garantiyan bide.

Tirkiyeyê li civîna NATO’yê di bedêla erêkirina Sekreterê Giştî yê NATO’yê de şantaja girtina Roj TV’ê kir. Ev di civînê de bû sedema krîzê. Di qada navneteweyî de jî li hemberî vê şantajê bertekên mezin rû dan û bi vî awayî helwesta Tirkiyeyê ya dijberî çapemeniya azad jî aşkera bû. **ENQERE**

Clinton mikur hat: Polîtîkaya Kubayê têk çû

Wezîra Karên Derve ya Amerîkayê Hillary Clinton got ku polîtîka Amerîkayê têk çû û ji ber vê jî dê polîtîka xwe ji nû ve di ber çavan re derbas bike.

Clinton li Komara Domînîkanê li ser mijarê axivî. Di axaftina xwe de diyar kir ku ew ji ber daxuyaniya Serokdewletê Kubayê Raul Castro bextewar in. Castro destnîşan kiribû ku ew amade ne der barê mafên mirovan û azadiya çapameniyê de û li ser girtiyên siyasî amade ne ku bi Washingtonê re rûnin. Lê Castro xwest ku statûya hevdîtinan wek dewletên wekhev pêk bê.

Clintonê diyar kir ku Amerîka vê daxuyaniyê di cih de dibîne û Washington daxwazê bi baldarî dê binirxîne. Clintonê diyar kir ku ew difikirin ku çawan bersiv bidin vê daxwazê.

Clinton ligel Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama ji Komara Domînîkan çûn Trînîdadê. Li vir dê beşdarî Civîna Bilind a Parzemîna Amerîkayê bibin. Hat gotin ku Obama di vê civînê de ji ber polîtîka Washingtonê ya Kubayê dê rastî zextan bê. Zextên herî zêde ji aliyê welatên Amerîka Latîn ve tên kirin. Li Amerîka Latîn her diçe Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) têk diçin û eniya sosyalîst a Amerîka Latîn xurt dibe.

Ambargoya DYA’yê ji ber xurtbûna eniya sosyalîst a Amerîkaya Latîn têk çû û pûç derket. Ji vir 10 salan berê DYA’yê Amerîka Latîn wek baxçeyê pişt mala xwe didît. **WASHIGTON**

Talîmata veşartî ya rejîma Sûriyeyê ya li dijî kurdan

Bi belgeyeke nepenî derket holê ku rejîma Baas a Sûriyeyê li dijî kurdan polîtîkayên nepenî yên faşîzanî dide meşandin. Belgeya mijara gotinê rejîma Baas ji rayedarên eyaleta Hasekeyê re dişîne û di belgeyê de ferman li rayedaran tê kirin da ku nehêlin kurd ji qanûnan sûdê wergirin. Li gorî qanûnê hin kurd dixwazin ji qanûnên Sûriyeyê sûdê wergirin. Di vê çarçoveyê de ji rayedaran tê xwestin ku pêşî li vê bigirin. Di vê belgeya veşartî de tê gotin ku kurdên başûr piştgirî dane Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê; ji ber vê jî ew wek li ereban xayînî kirine dide nîşandan.

Belge di rojên borî de ji aliyê rojnamegereke kurd ku li Lubnanê dijî û navê xwe diyar nekir ve hat bidestxistin. Belge di malpera nûçeyan ya bi navê Soparo de hat weşandin. Belge ji rayedarên herêma başûrojavayê Kurdistanê û rêveberên herêmî yên Baasê re hat şandin. Ev belgeferman roja 3’yê meha mijdara sala 2008’an hatiye şandin. Belge wek fermana veşartî li hember kurdan tê bikaranîn.

Di vê belgeyê de rewşa Iraqê jî digire dest û pozîsyona kurdan a li Iraqê wek hevkarê DYA’yê bi nav dike. Tê gotin ku li Iraqê piştgiriya kurdan a ji bo DYA’yê li dijî ereban e û ‘îxanet’ e. Her wiha tê destnîşankirin ku kurd ji îstîxbarata “Israîl û DYA’yê re dixebitin. Piştî van şîroveyan hikûmeta Sûriyeyê kurdan wek neyarê ereban diyar dike û wiha didome: Hikûmeta Sûriyeyê li ser helwesta kurdan a neyariya ereban ev biryar girtine.

Hikûmeta Sûriyeyê di belgeyê de Serokê Herêma Federal a Kurdistanê Mesûd Barzanî jî bi îdiaya ku ‘erdê ereban’ ango erdê Herêma Federal a Kurdistanê bo ku ji artêşa DYA’yê re vekiriye jî bi îxanet û diziyê sûcdar dike.

Di belgeya nepenî de biryarên ku hatine girtin û ji rêveberiya herêmî ya Hesekê tê xwestin bixe meriyetê ev in:

1- Nehêlin kurd ji qanûnan sûdê wergirin û jiyana xwe baş bikin. Qanûnan li dijî wan bi kar bînin û vê helwesta xwe veşartî bimeşînin.

2- Nehêlin li dikanan dîmen û fotoyên serok, serokên leşkerî û partiyên kurd cih bigirin.

3- Heta ji destê we tê destekê bidin berxwedêrên Iraqê yên ku hûn wan nas dikin.

Di belgeya veşartî ya rejîma Baas ya Sûriyeyê de rasterast navê kurd bi kar tê û ev daxwaz têne kirin. Rejîm ligel ku bi awayê fermî heyîna kurdan nas nake û dayîna nasnameyê ya ji bo kurdan jî red dike. **BEYRUD**

Îran ji darvekirina mirovan têr nabe

TEHRAN - Li Şîraza başûrê Îranê kesekî girtî hat darvekirin. Agahî di rojnameya bi navê Horasan de hat dayîn. Di daxuyaniyê de hat gotin ku kesê bi navê Amîr Kh.hat darvekirin. Lê nehat gotin ku di kîjan dîrokê de ev darvekirin pêk hat. Li gorî rapora Rêxistina Navneteweyî ya Efûyê (Amnesty International) di sala 2008’an de li Îranê 346 kes hatine darvekirin û pirtirê vana jî muxalîf û siyasî ne. Lê ji ber ku rejîma Îranê darvekirinan vedişêre tê gotin ku hejmara kesên li Îranê hatine darvekirin hê jî zêdetir e. Li gorî daneyên ajansa ANF’ê di meha nîsanê de hejmara kesên hatin darvekirin 6 e. Di meha adarê de bi kêmanî 33 kes hatin dervekirin. Ji serê salê şûnde 103 kes li Îranê hatine bidarvekirin.

Îranê 8 sal ceza dan rojnameger

TEHRAN - Rojnamegera amerîkî ya bi navê Roxana Saberî bi hinceta ku ji îstîxbarata Amerîkayê re dixibite 8 sal cezayê girtîgehê danê. Parêzerê rojnamegera amerîkî Abdulsamed Koramşahî der barê mijarê de daxuyanî da. Di daxuyaniyê de got ku doza Saberî roja duşemê li dadgeha paytexta Îran Tehranê tê darizandin. Lê nayê zanîn ku doz kengê bi dawî bûye. Saberî di meha çileya borî hat girtin û ji ber ku bê akredîtasyon xebitîbû ew hatibû girtin. Lê li Îranê muxalîf pir hêsan tên sûcdarkirin û ceza li wan tên birîn.

Di teqînê de 18 hatin kuştin

PEKÎN - Li eyaleta Hunan a Çînê di kana madenekê de depoyek sêqat ya funye û dînamîtan teqiya û ji ber vê teqînê bi kêmanî 18 kes mirin û 6 kes jî birîndar bûn. Hat gotin ku 3 kes jî hê nehatine dîtin. Polîs mijarê dişopîne û li ser teqameniyên neqanûnî li depoyê hene an na lêkolînê dike.

Elîyev: Rûsya hevkarê me yê stratejîk e

Serokdewletê Rûsya û Azerbaycanê piştî civîna li Moskowê daxuyaniyên balkêş dan. Diyar kirin ku ew li ser pirsgirêka Qarabaxê jî axivîne.

Civîn li mala Serokdewletê Rûsyayê Dîmîtrî Medvedev pêk hat. Piştî civînê Medvedev pesnê aboriya nav her du welatan da.

Medvedev destnîşan kir ku bazirganiya nava her du welatan 40 qat zêde bûye. Rûsya dixwaze ji Azerbaycanê gaza xwezahî bikire. Hat diyarkirin ku di vê der barê de hêviyên wan hene ku bi ser bikevin.

Eliyev jî diyar kir ku Rûsya dostê Azerbaycanê ye û ligel cîran hevalbendê wan ê stratejîk e.

Serokdewletê Azerbaycanê vegot ku ne pêkan e konsepteke giştî ya hevpar li ser pirsgirêka Qarabaxê pêk bê lê hin pêşketin jî hatine bidestxistin.

Medvedev li ser pirsgirêka Qarabaxê vegot ku ev pirsgirêk çareseriya wê pêkan e û pêşniyar kir ku di navbera Azerbaycan û Ermenistanê de bênavber hevdîtin bidomin.

Di daxuyaniyê de mijara herî girîng diyarkirina hevkariya stratejîk e. Ev ji bo Qafqasyayê demeke nû ye. Heke wisa bidome kontrola Rûsyayê ya li Qafqasyayê dê xurtir bibe. Jixwe bextewariya Medvedev ya di vê daxuyaniyê de mijara herî balkêş bû, ev bextewarî bextewariya serkeftina Rûsyayê ya li Qafqasyayê ye. **MOSKOW**

www.rojkurdi.org

Kampanyaya li dijî sunetkirina jinan

Kampanyaya saziya Mafên Mirovan a EuroKurd (EHR) li dijî sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê dayî destpêkirin, befireh dibe.

Saziya Mafên Mirovan a EuroKurd (EHR) demek berî niha bi piştgiriya gelek saziyên civakî li hemberî sunetkirina jinana kampanyayek dabû destpêkirin. Ji bo dawî li vê pêkanîna li dijî jinan bê di çarçoveya kampanyayê de gelek saziyên mafên mirovan ên li Ewropa û navneteweyî hatin agahdarkirin û ji wan hate xwestin ku bêdeng nemînin. Her wiha di çarçoveya kampanyayê de ji Hikûmeta Herêma Kurdistana Federal jî hate xwestin ku suneta jinan qedexe bike. **AMED**

'Piştgirî bidin kampanyayê'

Endama KJB'ê Sulbus Perî, bal kişand ser kampanya 'Em ne namûsa tu kesî ne namûsa me azadiya me ye" û got ku divê di her qada civakî de xwedî li kampanyayê derkevin û piştgiriyê bidinê

Endama Koma Jinên Bilind Sulbus Perî bal kişand ser namûsê û got, jin her roj bi navê namûsê tûşî şîdeta mêr tê û heta tê kuştin jî. Perî, diyar kir ku van bûyerên ku em dikarin jê re bêjin tevkujiya jinê, di civakê de wekî 'paqijkirina namûsê' pesnê wê tê dayîn û çepik jê re tên lêdan. Perî, diyar kir ku kampanya 'Em ne namûsa tu kesî ne namûsa me azadiya me ye" di her qada civakî de divê bê pêşxistin û ji ronesansa Rojhilata Navîn re pêşengiyê bike. Perî, destnîşan kir ku divê her kes piştgiriyê bide kampanyayê.

Ji zîhniyeta serdest rizgar bibin!

Sulbus Perî, destnîşan kir ku heta têkoşînek li hemberî kuştina bi hinceta namûsê neyê dayîn pêşketinek çênabe û wiha axaftina xwe dom kir: "Heta ku di jiyan û têkiliyên navbera cinsan de hikumdariya mêr a li ser jinê ranebe, azadî tenê wê di warê razber de bimîne. Jin bi salan e li hemberî serdestiya mêr têdikoşe û di vê mijarê de destkeftinên girîng bi dest xistin. Wan destkeftinan di jiyana jinê de hin başî anîbin jî, asta jiyanek ku bikaribe bi temamî ji bin serdestiya zilam rizgar bibe dernexistiye holê."

Kuştina bi navê namûsê

Perî, diyar kir ku tehekuma li ser jinê bi modernîteya kapîtalîst ziravtir tê meşandin. Perî, got ku şîdet û kuştinên li hemberî jinê, li welatên wekî Rojhilata Navîn û Asyayê ne di bin navê namûsê de bi rêbazên cuda tên kirin û wiha axaftina xwe dom kir: "Di welatên tê behskirin de jin li nava çar dîwaran tê girtin. Sîstema kapîtalîst nirxên aîdê jinê dejenere kiriye, jin aniye warê qada pergala kar û sermayeyê. Jin di vê qadê de wekî sîstematîk bi şîdeta fizîkî û psîkolojîk re rû bi rû dimîne. Gotin di cih de be, mîna berxika di xonçeya guran de, her roj hin tişt ji wê tê qetandin, bê nasname û bê kesayet tê hiştin. Di qada bazara kapîtalîzmê de lêgerîna jiyan û azadiyê, şaştî û çewtiyeke herî xeternak e."

Kampanya girîng e

Perî got ku li hemberî dubendiya 'jin namûs e' Tevgera Azadiyê têkoşîneke xurt daye û wiha axaftina xwe dom kir: "Di civaka kurd de her tim rê li ber guhertinan heye. Li Kurdistanê namûs wekî tabûyê tê dîtin û nayê nîqaşkirin. Pêşketinên ku di zîhniyeta civaka Kurdistanê de derketiye holê lez daye pêşketina têkoşîna azadiya jinê jî. Hê xweferzkirinên serdest ên ku jinê bê nasname dihêlin hene. Wekî têkoşîna pejirandina rêgezeke civakî û koletiya jinê koletiya civakê ye, azadiya wê jî azadiya civakê ye. Ji bo jî kampanyaya ku YJA'ê daye destpêkirin girîng e."

Sulbus Perî, diyar kir ku li hemberî desthilatdariya mêr a ku li ser beden û keda jinê avabûyî, divê têkoşîn, şoreşeke zîhnî û çandî bê dayîn. Perî di axaftina xwe de bal kişand ser têgihînên ku jinê wek namûs dibîne, bê îrade, nezan, bê rêxistin û bindest dihêle bi hezaran qehremanên Tevgera Azadiyê yên wekî Zîlan, Bêrîtan, Sema, Nûda bûne bersiv. **BEHDÎNAN / ANF**

Bedena xwe da ber agir

Li qezaya Daquqê hate îdiakirin ku jineka 75 salî ji zilma ku kurên wê li wê dikirin, xwe şewitand û jiyana xwe ji dest da.

Cîrana jina 75 salî diyar kir ku hewara jinekê bihîstine. Em hemû derketin derve û me dît jina cîrana me ya 75 salî neft bi xwe de kiriye û xwe şewitandiye.

Wê çavkaniyê aşkera kir ku ew jin bi eslê xwe tirkmen e û ji aliyê kurên wê ve zilmeke zêde li wê dihate kirin û got: "Ji ber rêjeya zêde ya şewatê, berî ku bigihînin nexweşxaneyê di rê de jiyana xwe ji dest da."

Her wiha li Kirmaşanê jî jinekê agir berda bedena xwe. Li Ciwanroya Kirmaşana rojhilata Kurdistanê hate îdiakirin ku jineke kurd agir berda bedena xwe. Hate diyarkirin ku jina ciwan ji ber zext û zordariya malbatê xwe kuştiye.

Li Selasî Bawecanê jî jina bi navê Nusret Qadriya 40 salî jî hate îdiakirin ku agir berdaye bedena xwe.

Li rojhilata Kurdistanê tê îdiakirin ku xwekuştina jinê zêde bûye. Jinên ku xwe dikujin jî agir berdidin bedena xwe û gelek jin bi îdiaya ku bedena xwe dane ber agir jiyana xwe ji dest dide.

Li rojhilata Kurdistanê der barê kuştin û xwkuştina jinan de îstatîstîkeke fermî nîn e. Her sal bi sedan jinên ciwan bi şewatê jiyana xwe ji dest didin.

Her wiha gelek malbat kuştina jinê wekî xwekuştin nîşan dide û hêj jî di nava civakê de bûyerên bi vî rengî didomin.

KERKÛK/ KIRMAŞAN

Li Iraqê 3 mîlyon jinebî hene

Li gor istatîstîka dawîn ya wezareta Iraqê derket holê ku li Iraqê ji sê mîlyonan zêdetir jinebî hene.

Wezîra berê ya karûbarê jinan ya hikûmeta Iraqê Newal Samerayî da zanîn ku li gorî îstatîstîkên wezareta plandananê ya Iraqê hejmara jinebiyên Iraqê ji 3 mîlyonan zêdetir e û ji mîlyon û nîvek zêdetir ji vana ciwan in.

Wezîra berê ya karûbarê jinan ya hikûmeta Iraqê Newal Semareyî got: "Ev jinebî, jinên ku di şeş salên borî de mêrê wan hatine kuştin in." Lê berpirsiyarekî din ê heman wezaretê ji rojnameya Elheyatê ya Londonê re daye zanîn ku hejmara jinebiyên Iraqê ji 3 mîlyonî zêdetir e û hikûmeta Iraqê ji bo ragirtina hevsengiya civakî, hejmara rastîn aşkera nake. **BEXDA**

Rewşen

Mamoste Xemrevîn

Zarok û Duzimanî -II-

Di hînbûn û hînkirina zimên de çar paye hene. Guhdarîkirin, axaftin, nivîsandin û xwendin.

Gelo ji bo çi di destpêkê de guhdarîkirin?

Ji ber ku zarok di destpêkê de tenê guhdarî dikin û paşê diaxivin, di hînbûna zimên de gava ewil, guhdarîkirin e. Mirov nikare di destpêkê de xwendin û nivîsandinê yan jî rêbazên rêzimaniyê hîn bike. Gava ku diçe dibistanê ev rêbaz ji bo perwerdehiyê dikevin jiyana zarokan. Lê ev rêbaz ji bo zarokên ku bi zimanê dayika xwe perwerde dibin derbasdar e. Yanê zarok li malê bi kîjan zimanî diaxivin li dibistanê jî bi wî zimanî perwerde dibin. Ev yek mîna ku hûn berê xîmê xaniyekî dikolin û paşê li ser wî xîmî xaniyê xwe hêdî hêdî dihûnin û avahiyê bi awayekî saxlemtir çêdikin.

Lê gava ku em li rewşa zarokên kurd dinêrin, ev rêbaza xwezayî serobino dibe û rêbazeke li dijî xwezayê derdikeve pêş me. Zarok ji şeş saliya xwe careke din vedigere rewşa dergûşekê û ji nû ve dest bi zimanekî dike.

Zimanzan dibêjin ku;

✓ Heke kesek rê û rêbazên zimanê xwe baş nizanibe, nikare zimanekî din jî hîn bibe.

✓ Heke kesek bi zimanê xwe perwerde nebe, bi perwerdehiya zimanekî din serkeftî nabe. Ji bo vê yekê jî bê perwerde bimîne ji ya din baştir e.

✓ Heke tê xwestin ku kurd ji zimanê tirkî hez bikin û bixwazin bi awayekî baş tirkî hîn bibin divê di serî de bi zimanê xwe perwerde bibin. Bi rastî jî gava ku em li rewşa zarokên kurd a li dibistanan dinêrin, ev yek gelekî aşkera tê dîtin. Zarokên kurd ji tirkî hez nakin.

✓ Zarokên ku bi zimanê dayika xwe perwerde nebin, hem bi xwe pirsgirêkan dijîn hem jî dibin sedemên gelek pirsgirêkên civakî û tu carî jî serkeftî nabin. Ev zarok her du zimanan jî nîvco hîn dibin û dibin kesên nîvzimanî.

Îro rewşa zarokên kurdan jî di welatê wan de wisa ye. Ne baş kurdî dizanin, ne jî tirkî. Heke bi her du zimanan jî perwerde bihata kirin, zarok dê gelekî serkeftî bûna.

Zimanzan û pedagogên îngiliz û yên alman li ser duzimaniyê gelek lêkolîn kirine û gihîştine van encaman:

1- Zarokên ku bi du zimanan perwerde dibin bi alîkariya rêz û rêçikên zimanê xwe dikarin zimanekî din rehetir hîn bibin.

2- Zarokên duzimanî bi xwe bawer in û cîhana wan a fikr û ramanê li gorî zarokên din firehtir e.

3- Ev zarok xwedî li mîrateya ziman û çandan derdikevin û ji wekheviyê re rêzdar in.

4- Di qada civakî de serkeftî ne û berpirsiyariyê digirin.

5- Xwesteka wan a di warê lêkolîn û vekolînê de zêdetir e.

Berxwedana Arslan didome

Platforma Jinan a Stenbolê ya Piştevaniya Berxwedana Desayê bi çalakiya xwe piştgirî da karkera DESA'yê Emîne Arslan. Berxwedana karkera DESA'yê Emîne Arslan ket roja xwe ya 289'an. Endamên platformê li cadeya Îstîklalê li ber maxezeya DESA'yê çalakiyek pêk anîn. Platform pankarta 'Berxwedana jinên DESA'yê didome' vekirin û gotin ku dê têkoşîna xwe bidomînin. Jinan bang kir ku dê her tim li hemberî nêzikatiyên cudabûna cinsiyetê derkevin û berxwedaneke hevpar bidin meşandin. **STENBOL**

www.arsivkurdi.org

Alayên Hamîdiye û xêrnexwazî

Di sala 1891'ê de Alayên Hemîdiye ji bo kurdan parçe bikin peywira polîtîk girtin ser xwe. Ev alayên ku girêdayî Osmaniyan bûn ji malbat, eşîr û mîrên ku dijminê qewmê xwe ne û li Babialî mezin bûne, pêk dihatin

ERDOGAN ALTAN

Di dema Siltan Abdulhamîd de, ligel hemû nerazîbûnan di sala 1891'ê de Alayên Hemîdiye ku navê xwe ji Abdulhamît standiye, ji bo kurdan perçe bike peywira polîtîk girte ser xwe. Ev alayî ku girêdayî Osmaniyan e, ji malbat, eşîr û mîrên ku dijminê qewmê xwe ne û li Babialî hatine gihiştandin, ava bûye.

Riya xiyanetê dane pêş

Yek ji vê peywira polîtîk a qirêj ya balkêş jî ew e ku eşîrên qels derdixistin pêşiya eşîrên bi hêz ên li hemberî rejîma Osmanî. Ji ber vê yekê jî ji bo bûyerên derkevin wek hêza ewlehi karibin pêşî bigirin, xiyanet dane pêş, li ser vê yekê wan biçek kir û dînamît xiste binê adet û kevneşopiya civakî. Bi vê yekê re nakokiyên ku di nava eşîran de hebûn, kûr kir. Di bin rastiya vê qelskirina civaka kurd de, em ê pişt re hîn bibin piştî sedsaleke din li hemberî Tevgera Azadiya Neteweyî hin eşîrên ku hebûn û tunebûna wan ne diyar e biçek bikin. Ya rastî cerdevanî ku di nava kurdan de wek 'dijminê qewmê xwe' tê binavkirin, ehlaqa civakî tarûmar bikin. Vê rastiyê mirov bi gotinên pêşiyên kurdan a 'Qereç kirin paşa pêşî bavê xwe qir kir' ev gotin girîngiya vê mijarê datîne holê. Çekan dane kesên mêrekor, hêz xistin destên wan û berdan ser muxalifên dewletê. Her kesî dît ku vê yekê rê li ber gelek nexweşî û birînên nayên dermankirin vekir.

Belê di bin vê projeya ku ligel hemû rexne û nerazîbûnan ji hêla Osmaniyan ve bi navê Alayên Hamîdiye hate avakirin de ev mantiq heye.

Osmanî dikûjin lê her tim sûcdar kurd in

Alayên Hamîdiye çawa me got her yek ji wan di her mijarî de subabên ewlehiyê ne. Di wan salan de li hemberî Tevgera Fileyan ku gav bi gav bi pêş diket, bi taybetî li Kurdistanê Osmaniyan wek çeka herî bibandor, vê avakariya ku di nav ritama xiyaneta xwe de asê man e, bi kar bînin. Van yekan bi dilxwazî hin tiştan li polîtîkaya komkujiya Osmaniyan zêde dikirin û xwe ji qiral zêdetir qiral didîtin. Ev yek jî dide nîşandan van alayiyan ku bûne wek toqa naletê çiqas ehlaqê civakê texrîb dike.

Van du gelên ku li ser heman axê bi taybetî jî bi aştiyane bi hev re jiyane, bi hev didan qirqirin, bêehleqiya wan çiqas pêşve çûye, dide nîşandan. Bi taybetî tê gotin ku 300 hezar ermen di navbera salên 1895-1896'an de hatine qetilkirin. Û piraniya van jî bi destê Alayiyên Hamîdiye hatiye kirin. Bi gotina din jî, ev hovane bi destê kurdên ku xwe ji bo hevkariya alayiyan amadekirine, hatiye kirin. Garo Sasonî ku dîrokiya têkiliya kurd û fileyan dinirxîne, dibêje; "Osmanî dikujin lê her tim sûcdar kurd in. Çews û pêkutiyan dike, yê biqebehat dîsa kurd e. Lê tu felaketek tuneye ku kurd nake û tu zilmek nîne ku yê mexdur jî dibe ermenî ne." Bi vê rê û rêbazî ya van alayiyan ku civakê perçe dike, dike ku kurd xwe bi xwe serê hev bixûn.

Bi wan pêvçûnên navxweyî enerjiya wan xilas dike. Îstîsna qeîdyê xira nake. Her çiqas pişt re, yên wekî Alayê Mîr-Xalid Cîbranlî, di têkoşîna neteweyî de cih girtibin jî, di eslê xwe de ev yek rastiyek ku Alayên Hemîdiye di dilê civaka kurdan de wek xencerek, wek texrîbkarê civakê, qelişandin û qansêrkirinê ye.

Li cihên ku Alayên Hamîdiye têr nakin, kurdên ku eşîra wan tûne ne û di bin banê Alayên Hamîdiye de ne, rûtbe didin wan, wan derdixin pêş û wan di qirqirina fileyan de bi kar tînin. Bi vê yekî re, ekîbek bimayînkirî ku hadê xwe nizane, pîvanên edebê nizanin, ji raya xwe derketine, kengê û li kuderê ji hêla kî ve bên bikaranîn ne diyar, hate avakirin. Ev yek bi heman demî ji bilî kurdên serdest, tê wateya kesên hevkarî yên dijminê qewmê xwe derdixin pêş. Çawa me got, tiştekî dişibe wî, sedsal pişt re li hemberê Tevgera Azadiyê, cerdevaniyê tê bikar bînin, wê gelê kurd biêş bibînin.

Serîhildêr hatin sirgûnkirin

Di sedsala 19'êmîn de piştî tepisandina serhildanan, hemû ferdên malbatên ku hin caran tevlî dibûn, wek Serhildana Bedirxan de hate dîtin, dihatin sirgûn kirin. Hin caran jî zarokan dibirin Stenbolê di dibistanên Babîalî de perwerde dikirin. Çawa be ji bo pêşerojê razemenî divê. Li Stenbolê dibistanên eşîrê ji ber vê yekî dihatin vekirin. Zarokên mezinên eşîrên hevkaran (îşbirlikçi) û malbatên hevkaran di van dibistanan de perwerde dikirin. Tabî zarokên nedixwestin û li berxwe didan jî, ji wan islah bikin, wek subabên ewlehiyê di van dibistanan de dîl digirtin (rehîn) û digihandin. Yên dihatin gihandin jî di Alayên Hamîdiye de peywirdar dikirin û yên din jî di burokrasiya Babîalî de peywirdar digirtin. Kurê Şêx Ubeydullahê Naîrî, Şêx Evdilkadir ku wê pişt re bihata îdam kirin, dikaribû bibûya Serokê Senatoyê jî. Her wiha kurê Bedirxan Emîn Bedîrxan dikaribû bibûya şefê îstîxbaratê ya leşkerî.

Di dibistanên Babîalî de perwerde dikirin

Perwerdekirina van kesan di van dibistanan de, esasê xwe de ji bo ji civaka di nav de ji dayik bûne, biyanî bikin perwerdehî dihat dayin. Ev ne bes bû bi destên van kesên di van dibistanan digihan civakê islah bikin. Jixwe çaxa be ev kesan zarokên malbatên tên naskirin in. Her wiha ev kesên ji xwe dûr bûne, ziman jî dizanin. Nivîs dizanin. Pênûsa wan baş dinivsîne. Çek û bergê wan dişibe yên din. Ji ber vê yekê ev kesên hatine gihandin ji bo vê civakî bê wate bihêlin, di burokrasiyê de, pêwîst bike di

Eşîrên kurdan kirin amûrê polîtîkayê

Bi esasî, li ser girêka dîrokî girêkeke kor hate zêdekirin. Eşîrên kurdan carekê din bûne amûrê polîtîkaya ji derve ve li ser wan didin bikaranîn. Çawa ku me got piştî sedsalê din heman dijmin, lê evcar ne wek Osmanî wekî Dewleta Komara Tirkiyeyê vê lêstikê kur kir û wê bidomîn e. Cerdevaniyê kurtir kir avête nava wan salan, hêstên tolhildanê ya di kurahiya dil de veşartî û yê hatî çewisandin cardin zindî bike û ji bo bibe bela serê gelê kurd, nexweşînek sûnî afirandibûya.

Çawa di Alayên Hamîdiye, cerdevanî jî ji ber rola xwe yê perçekirinê bi meaşê bi xelat bikin. Nakokiyên di navbera eşîran hate kurkirin. Eşîrên li hev bûne dijmin, bi hev ketin, ji zanîna çalakiya li hemberî mêtîngeran dûr bikevin. Ji ber vê yekê ye ev alayî di sala 1891'an de 40 bûn, piştî sala 1893'an de ji 63 eşîrên mezin, 80 heta digihije 100 alayî tê çêkirin. Her alayî ji 800'an jî hezar kesên bi çek pêk dihatin.

Ji ber vê yekê ye ev alayî di sala 1891'an de 40 bûn, piştî sala 1893'an de ji 63 eşîrên mezin, 80 heta digihije 100 alayî tê çêkirin. Her alayî ji 800'an jî hezar kesên bi çek pêk dihatin.

cihên bibandor de peywirdar kirin. Ji ber dinivsînin, wan didan pêş. Ji ber hêza wan a duşuncê û axaftina wan hebû, her çiqas hatibin gihandin jî, cihên diçûn wir ji ber rêza malbatê bicih dibûn. Gel qimet dida wan. Ew hembez dikirin. Ji xwe çawa be zarokên malbatên ku berê de berxwedan kiribûn e. Kêm ji van kî tê gotin îstîsna qaîdeyê xira nake, rê û rêbaz nîşanî gel didan û ji bo gel tiştek dikirin. Lê piraniya wan ji ber ji civaka xwe dûr ketibûn xêrnexwazî dijiyan.

Çiroka devşirme Kara Îbrahîm

Dîsa di Romana 'Veqetandina Rê' (Yol Ayrımı) de, fermandarê Yenîçerî yê bi navê Kara Îbrahîm çawa zilm û zordariyek mezin li gelê Bulgaran dike, vedibêje. Qerargah datînin gundek. Rojek di mala rûspiyê gundê de keçek bedew lê pir bedew heye, dest datîne li ser. Pişt re tecawiz dike. Ruspiyê gund tê bi Kara Îbrahîm Paşa re hevdîtin dike û jê re dibêje "Ew keça te tecawiz lê kir xwişka te ye". Yanî Kara Îbrahîm Paşa beriya salan de malbata wî tê qetilkirin ji vê gundê tê revandin, piştî wî dikin devşirme û mezin dikin wî berdidin û êrîşê ser gelê xwe dike. Kara Îbrahîm li mala ruspiyê gund tecawiza xwişka xwe ya ji malbatê ew tenê maye dike. Lê ruspiyê gund, baş dizane Kara Îbrahîm kî ye kurê kiye. Dema Kara Îbrahîm vê rastiyî hîn dibe, bi destek gule bera serê xwe dide.

Devşirme, avakirina konê xiyanetê ye

Belê, ji vê yekî re dibên Mangurtî, devşirme, ji nû ve gihiştandin, tovekê nû. Ev yek afirandina bûyerek xiyaneta bi xwe ye. Belê, di qesrên Osmaniyan de devşirmeyên pêşerojê li ser vê esasî tên amadekirin. Armanca gihandina di Babialî de şikil û şemalên ku deh salên pêşerojê biafirîne. Wê wisa biafirînî ku sedsal jî derbas bibe ew tov ew şitilê hatiye avêtin, şîn bibe. Wek Bekoyê qereç ku di nava Mem û Zînê de wek giyayê biyanî şîn bibe.

Em bidomînin. Di van salan de gelek 'rewşenbîr' ên kurd jî digihên. Em çend kes ji wan bijmêrin. Haci Qadirê Koyî, Seyît Abdulkadir, Seîdê Kurdî, Emîn Elî Bedirxan, Xelîl Xeyalî, Hemzeyê Mîksî, Ehmed Ramizê Lîcê, Memduh Selîm, Evdilehê Cevdet, Mihemed Şikriyê Sekban, Tevfîkê Silemanî (Pîremert), Mewlana Zadê Rifat û bi dehan kesên em nikarin bijmêrin.

Rêxistinên ku wê pişt re bên avakirin wek Kurd Teavun û Terrakî Cemiyetî (1908) Kurd Tealî Cemiyetî (1914) û wekî wan, yên pêşengiya van dikirin, hemû zarokên di Babialî de hatine gihiştandin, di dibistanên eşîran de hatine gihandin û zarokên di serhildanan de hatine teslîmkirin in. Em hemû wek di hêla neyînî de nabêjin, lê di hêla rastî û objektîf de jî, tabloya derketî holê ev e. Gelek kovarên kurdî jî hatine derxistin. Pirsgirêk ji bilî niyeta baş an jî nebaşî, dema mirov li dîrokê dinêre divê mirov bi objektîf nêzîk bibe. Ji ber ku tu kes bi daxwaza xwe xiyanetê nake. Heke pêvajoya dîrokê neyê nirxandin, heke bersiva pêvajoya dîrokî neyê dayîn, ew kesên ku divê bibin hêviya vî gelî û nikarin bibin, rastiya derdikeve holê jî an xeflet e, yan jî ji wê zêdetir xiyanet e.

Xêrnexwazî; devşirmekirina him fizikî û him bi giyanî

Wateya xêrnexwazî, li gor di romana Cengîz Aytmatof a di pêvçûnên navbera eşîrên Kirgiz an de pêk dihat, wek rêbaza xizmên wan nerm bike û li hemberî dijminê xwe bikaranîn, tê bikaranîn. Ev yek tê wateya devşirmekirina him fizikî û him bi giyanî. Ew ferdê tê devşirme kirin pêşî porê wî/ê qur dikin. Bi rastî heta goştê serê wî/ê tê xwinkirin qur dikin. Hê êşa wê tazeye postê sewalekî piranî deve tê tercîhkirin bi germe germ li serê mexdur dikin. Ji bo neyê derxistin jî bi benê hişq didirûn. Bi vê şiklî li nîvê çolê bi qazoxan ve girê didin. Di bin tîrêjên rojê ya germ de, dest û milên wî girêdayî, birçî lê ji bo nemire jî av didine yê. Yê av bide yê jî axa ye. Di pêşerojê de yê hatiye devşirmekirin yek tenê nas bike ew jî ew axa yê av dabû yê. Her dem derbas bibe porê mexdur hêdî hêdî dirêj dibe, lê ji ber ew porê dirêj dibe zemîna baş dirêjbûnê nabîne, ew por berovajî biguhere. Yanî porçik bibe (kildonmesi). Ji ber van porê dizivirin mexdur çiqas here wê bêşiur bibe. Ji ber encamên porê di nav goştê de dizivirin, tava tuj û birçîbûn pir xirab e. Tevlîheva îşkence û birçîbûnê wê daneyine û êşên heta hetayê dide. Yê teseliyê dide, tenê tenê dilopa avê ya ji bo mexdur nemire, didin wî ye. Mexdur hê mehekî wî temam nabe bi fizikî jî dewşirme bibe. Yek kesek nas dike ew jî axa ye.

www.kurdi.org

Bi mijarên rengîn 'Çirûsk'

Kovara Çirûsk ku çar mehan carekê derdikeve bi babetên dewlemend derket pêşberî hezkiriyên xwe. Di vê hejmarê de nivîsên lêkolîner balê dikişîne û hevpeyvîn bi Helîm Yûsiv re hatiye çêkirin

Kovara hunerî û ramanî Çirûsk bi hejmara xwe ya 6'emîn bi mijarên cuda û rengîn derket pêşberî xwendevanên xwe.

Kovara Çirûsk ku ji aliyê Weşanxaneya Belkî 4 mehan carekê derdikeve bi hejmara xwe ya nû derket pêşberî kurdîhezan. Di vê hejmarê de gelek mijarên dewlemend cih digirin. Dîrektorê kovarê Rênas Jiyan di vê hejmarê de bi nivîsa "Di çîroknivîsiya Qedrî Can'î de hêmaya "kûçik" û têgeha "kûçiktî"yê" lêkolînek li ser aliyê çîroknivîsiya Qedrî Can kiriye. Her wiha ji aliyê Moran Ezdînî ve li ser romanên kurdî yên bi zaravayê kurmancî hatine weşandin lêkolînek heye. Ji sala 1927'an heta 2008'an romanên ku bi kurmancî derketine dikarin bibin xwedî agahî. Hevpeyvîna vê hejmarê bi nivîskar Helîm Yûsiv re li ser wêjeyê hevpeyvîneke berfireh hatiye kirin. Her wiha di vê hejmarê de tekstek şanoyî "Dîroka Rûreş" ya Bûbê Eser jî di kovarê de cih girtiye. Nivîsên din ên weke çîrok, helbest, pexşan hwd. di kovarê de ev in: "Bikene" Husên M. Hebeş, "Çolistaneke Bedewî" Şêxmûs Sefer, "Dê û Law" Wehab Tilermen, "Dilê Esirî" Lokman Ayebe, "Dostoyevskî û şevên spî" Lokman Polat, "Ê te, derdê te cuda ye" Menaf Osman, "Evîna çavê qahpikeke qîzîn" Jan Ziryan, "Evîntirş" Bajar Mîrzeman, "Gorra xalê Cindî" Bahoz Baran, "Henase" Îlhamî Ozer, "Îşev" Hesenê Metê, "Kerberosên Pavlov'î" Seydo Ozkan, "Li-hev-hat" Hekîm Qozlûq, "Nayê bîra min" Delîl Purjan, "Otopsiya berbejnekê" Ferzan Şêr, "Pêşangeh" Şengul Ogur, "Pêta "Emr"î" Hecî Nehsan, "Qe(bir)" Robîn Şerna, "Rêwî û Welat" Yeqîn H., "Rist" Ali Arya, "Sê hîmên bingehîn ên îktîdarê; ol, sinc, sîgorte" Şevger Çiya, "Sebaret bi William Shakespeareî çend têbinî ji kêliyên zordest" Kawa Nemir, "Stêrk Dibarin" Ceylan Tarî, "Şilope" Janez Sar, "Tarî" Rojîn Xewn, "Tûrik" Feratê Dengizî û "Valahî bi tîna evînên bergorn hingavtiye" Baran Amedî. **AMED**



Farjad li Stenbolê ye

Vîrtuozê Kemanê yê navdar ê cîhanê yê îranî Farîd Farjad li Stenbolê bi hezkiriyên xwe re hate cem hev.

Farîd Farjad ku hosteyê kemanê ye û her wiha bi xebatên xwe yên girîng di nava vîrtuozên kemanê de li cîhanê jî wekî 'Bi hunera xwe kemana xwe da girîn' tê nasîn. Farîd Farjad li Stenbolê muzîka xwe pêşkêşî temaşevanan kir. Farjad muzîka gelêrî û muzîka klasîk a Rojava bi hev re dibêje û her wiha bi vê xebata xwe eleqeyeke germ dibîne. Farjad li Navenda Pêşangeha Bostanci ya Kadikoyê konsera xwe da. Farjad di sala 1938'an de li Tahranê ji dayik bû. Di muzîka gelêrî ya farisî de gelek xebatên wî hene û her wiha li ser muzîka klasîk a Rojava jî xebatên wî hene. Farjad li ser muzîka klasîk a Rojava û ya farisî gelek berhemên girîng derxistin holê. Di heman demê de Farjad li cîhanê di nava vîrtuozên cîhanê yên herî baş de tê nîşandan. Farjad heta niha 5 albumên bi navê An Roozha I, An Roozha II, An Roozha III, An Roozha IV û An Roozha V derxist. Ligel vê yekê albumeke bi navê Orkestraya Golha jî di nava berhemên wî de cih digirin. **STENBOL**

Ji Behramoglu şeva rûmetê

Şahiya ku ji aliyê Şaredariya Beşîktaşê ve tê lidarxistin 'Ji hosteyan re rêz' ji bo helbestvan Ataol Behramoglu pêk tê. Civîn dê di 20'ê nîsanê de li sahneya Melîh Cevdet Anday li Navenda Çanda Akatlar pêk bê. Helbestên Behramoglu yên wekî 'Min ji jiyana xwe tiştek hîn kir', 'Evîn a du kesan e', 'Heke ez bimirim dê ber bi êvarê bimirim' û 'Ev evîn dê li vir bi dawî bibe' bên xwendin. Ligel vê yekê dê werger, nivîsên çand û hunerî, antolojî û xebatên wî yên şanoyê di vê şevê de bêne pêşkêşkirin. Gelek helbestên Behramoglu ji aliyê Ahmet Kaya ve hatibûn xwendin. Moderator û amadekariya şevê Faruk Şuyun dike. Di şevê de dê Behramoglu bi taybetî û xebatên wî bêne nasandin. Her wiha dê malbat û hevalên wî jî ji nêz ve bêne nasandin. Alî Sîrmen, Ayşe Emel Mescî, Bariş Behramoglu, Dîlek Turker, Dogan Hizlan, Hasan Ceyhan, Haluk Şahîn, Hulya Behramoglu, Îkna Sariaslan, Namik Kemal Behramoglu, Onur Behramoglu, Salî û Turgay Fîşekçî dê wekî axêvger tevlî şevê bibin.

Her wiha mêvanên muzîsyen jî Edîp Akbayram, Haluk Çetîn, Tekîn Buyukkaya, Tîmur Selçuk û Vedat Sakman in. Şanoger Humay Guldag jî di şahiyê de dê helbestên Ataol Behramoglu pêşkêşî temaşevanan bike. Jiyana Behramoglu jî dê bi slaytekê bê nîşandan. Şahiyên 'Ji hosteyan re rêz' dê di 27'ê nîsanê de bi amadekariya Çîgdem Talu û Melîh Kîbar û 4'ê gulanê jî bi amadekariya Selîm Îlerî bidomin. **STENBOL**

Li Elbakê gera tîjikan

Midûriyeta Çandê ya Wanê bi boneya Hefteya Turîzmê bi komekê re ji bo dîtina tîjikan çûn gundê Taxikê.

Tîjikên li gundê Taxikê yê navçeya Elbaka Wanê li herêmê wekî Vanadokyayê tên zanîn. Li gund bi dehan tîjikên heyîn li benda eleqeyê ne. Midûriyeta Çandê ya Wanê bi boneya Hefteya Turîzmê bi komekê re ji bo dîtina tîjikan çûn Gundê Taxikê. Nûnerên çapemeniyê, acenteyên turîzmê û nêzîk 60 kesan beşdarî gera ji bo tîjikan hatiye pêkanîn bû. Her wiha komê Keleha Rekirê û Dêra St. Bartholomeos jî ziyaret kir. **WAN**

Ji 9 welatan 12 film

Di 12'emîn Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Uçan Supurgeyê de ji bo xelatên Yekitiya Rexnegirên Fîlmên Navneteweyî (FIPRESCI) ji 9 bajaran 12 fîlm tevli pêşbirkê dibin. Di 12'emîn mîhrîcana Uçan Supurgeyê de xelata FIBRESCI dê 7 û 14'ê gulanê bê dayîn. Li Polonyayê Anita Piotrowska, li Swêdê Leif Joley û li Tirkiyeyê jî Nil Kural juriya FIPRESCI hate avakirin. Li Almanya, Amerîka, Arjantin, Hindistan, Holanda, Hong Kong, Portekîz, Rûsya û Tirkiyeyê fîlmên jinan tevli Mîhrîcanê dibin. Her wiha fîlmê ku xelat wergirt dê di 14'ê gulanê de bi herwe bê nîşandan. **ENQERE**

Muptelayê Hibrê
Rênas Jiyan
renasjiyan@yahoo.fr

Dewlemendî û bûrjûwazî

Heger di kurdan de kategotiyên weke xwendekarî, karmendî, rewşenbîrî, hunermendî, siyasetmedarî, esnafî û bazirganiyê hebin, û weke çawa li dinyayê gişî ev kategorî weke kategoriyên "bûrjûwazî (bajarmendî)"yê hatibin binavkirin, wê çaxê ji ber ku di kurdan de jî ev kategorî hene tê wê wateyê ku di kurdan de jî bûrjûwaziyek heye; û pir normalek e ku ev bûrjûwaziya kurd jî weke hemû bûrjûwaziyên li her derê dinyayê ku doz û serkêşiya neteweperweriya xwe dikin ew jî doz û serkêşiya neteweperweriya kurd bikin.

Faktorên ku dibin sedem ku ev kategorî weke "bûrjûwaziya biçûk" bên binavkirin "aborî" û "hişmendî" ye, her wiha ev faktor ji bo "bûrjûwaziya mezin" jî derbasdar e. Ji bo ku mirov karibe ji karmendekî (mamosteyekî), nivîskarekî an jî ji siyasetmedarekî re bibêje "bûrjûwayê biçûk" divê ligel aboriya wî, hişmendiya wî jî li bûrjûwaziyê bifesile. Heger weke hişmendî wî xwe çênekiribe, ew mamoste, hunermend û siyasetmedar be jî ji bûrjûwaziyê nikare bê hesibandin, dibe ku ew gundî an jî hwd. be, lê ew ne bûrjûwa ye.

Ji ber ku "êdî" di kurdan de xwendekar, karmend, hunermend, siyasetmedar, esnaf û bazirganên "hişmend" hene em angaşt dikin û dibêjin di kurdan de çîna "bûrjûwaziya biçûk" heye. Û kengî endamên van kategoriyan gişan bi rastî jî ligel lewnê aboriya xwe ji xwe re hişmendiyek jî ava kir ew ê karibin bibin bûrjûwayên biçûk û ew ê hebûn û azadiya kurdan pêştir bixin.

Bajar-mend-î (bûrjûwazî), ne dewle-mend-î ye; bajar-mend-î, hiş-mend-î ye. Mirovek heta tu bêjî bes dikare "dewle-mend" be, lê heger ew mirov ne "hiş-mend" be nikare bibe "bajar-mend". Bûrjûwazî ango bajarmendî biqasî ku li "kar" û "berjewendî"ya zikê xwe difikire her wiha li kar û berjewendiya "hiş"ê xwe jî difikire. Ji bo kar û berjewendiya xwe, li xêr û serbestiya welat û milletê xwe jî difikire. Bi zikekî têr û bi hişekî birçî mirov dikare bibe dewlemend lê mirov nikare bibe bajarmend.

Di kurdan de dewlemend ji bajarmendan pirtir in; ji lew re ye ku di Tevgera Azadiya Kurdan de rola ku bûrjûwaziya kurd divê bilîsta qels e. Ji ber ku di kurdan de her kesê ku dewlemend e, ne bajarmend e hişmendî û serbestiya kurdan baş bi pêş ve nakeve; her wiha ev faktor dibe sedem ku "joresazî"ya (huner, zanyarî, rewşenbîrî hwd.) kurdan jî baş bi pêş ve nekeve. Heger ne wiha bûya wê rojekê dewlemendekî kurd derketaya û wî yê ji pirtûk an jî ji xebateke hunerî re sponsoriyek bikira; an jî dev ji sponsoriyê berdin ew ê rojekê derketaya û wî yê pirtûkeke kurdî bikiriya, bixwenda.

Lê biqasî ku em hebûn û azadixwaziya kurdan di bûrjûwaziya kurdan a biçûk de dibînin, em heman tiştî di bûrjûwaziya kurd a mezin de nabînin. Yek-dudu jê netê, heta mirov dikare bibêje ku bûrjûwaziya kurdan a mezin tune ye. Lê divê ev neyê wê mahneyê ku di pêşerojê de wê bûrjûwaziya kurd a mezin çênebe. Bûrjûwaziya ku îroj biçûk e, sibe wê mezin jî bibe…

Di roja rojnamegeriya kurdî de wêjeya kurdî

Li Dihokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd bi wesîleya 111'emîn salvegera rojnamevaniya kurdî dê bi dirûşma 'Wêje, Wijdana Mirov e' li ser nasîna wêjeya kurdî û çekî hin semînerên taybet dê li dar bixe. Ji bo zindîkirina bîranîna salvegera yekemîn rojnameya kurdî "Kurdistan", ku beriya 111 salan ji aliyê Miqdad Bedirxan ve li Qahîrê hatiye derxistin, Yekîtiya Nivîserên Kurd-Liqa Dihokê rojên semînerê li dar dixe. PEN'a Komara Çekistanê jî beşdar bibe. Di bîranîna 111'emîn salvegera rojnamevaniya kurdî de dê ev kes beşdar bibin; Ji Komara Çekistan ji bajarê Pragê, serokê PEN'a Çekî Jiji Dedeçek û serokê komîteya nivîserên zîndankirî Jana Çervinkova, profesor Daniyla Fşerova, rexnegir û helbestvan Kirjivanek Vilademir û nivîser Ivana Pixaçkova. **DIHOK**

www.arsivakurdi.org

Li ser dengbêjiyê çend gotin

Dengbêjî çi ye?

YAHYA KANDEMÎR

Dengbêjî wek nav li ser 'bi deng gotin' e. Deng û gotin bi hev re bibe yek û rîtma di meqamê de bi gotin bibe kilam û kilam bi deng bê gotin. Dengbêjî bi kurtayî ev e. Lê belê wateya dengbêjiyê û naveroka wê gelekî dewlemend e.

Dengbêj tiştên dilê mirov distrê, dibîne, dinêre, dijî û dibêje. Gava dengbêj kilamekê distrê ne gotibêj e, gotinçêker e jî. Her wiha dengbêj kilaman ji ber xwe diafirîne. Dengbêj eger kilaman beste neke, neafirîne, hêstên xwe nexe nav wê stranê, dibe ku ew ne dengbêj e.

Dengbêj bi gotin û awazê xwe bi sekna xwe, bi axaftina xwe, bi raman û hestên xwe dibe dewlemend û xurt dibe. Dengbêj kilaman ji ber xwe ve çêdike. Tiştên dijî û dibêje li ser wan kilaman derdixe. Kilam dibe jiyana dengbêj. Ji bo vê yekê helbestkarekî zor e. Zimanas e, bi zimanekî xweş, bi zimanekî zelal û bi zimanekî xurt dengbêj kilaman çêdike.

Dengbêj mîna fîlozofan e. Çawa? Dîroknas e, destan û efsaneyan di kilamên xwe de dibêje bûyerên di dîrokê de derbas bûne, hikumdar û paşayên mezin, îsyanên dîrokê hemû merheleyên dîrokê xwe di kilamên dengbêjan de girtine. Dengbêj ji erdnîgariyê, ji civakê, ji astronomiyê, ji siyasetê, ji xwezayê, ji tenduristiyê, ji coşê û derûniyê, ji evîn û evîndariyê baş fêm dike û nas dike. Dengbêj, wan beşên zanyarî bi xwendinê nas nake, bi gerê, bi gotinê bi pirsê û bi ramanên xwe yên taybet dinase.

Dengbêj gerok e. Mala wî li pişta wî ye. Bajar bi bajar, navçe bi navçe, gund bi gund digere. Gera wî jê re dibe wesîleya kilaman. Bûyerek biqewime dengbêj li wir e. Dengbêj tune be jî ba dengbêj dikin û dengbêj ew bûyer dike gotin, dike meqam û bi awaza xwe dike kilam. Di şahiyê de jî dengbêj amade ye, di civatê de, di cejnan de, di şerên dijwar de, di merheleyên dîrokî de, dengbêj gotina dawî dibêjin.

Dengbêj hosteyên dengên wekî dengên zirav, dengên xurt, dengên biçûk, dengên mezin dibêjin. Li gorî meqam dengên lîz û yekem, bi dengê duyem bi dengê sêyem û bi car dengan dema bang dike awaz diqîre. Herî qîrîna bi manîdar û taybet qîrîna dengbêjan e. Herî qîrîna xweş û delal a dengbêjan e.

Dengbêj behr e. Behra stran û kilaman e. Kilamên dengbêjan mîna çavkaniyeke bêdawî ye. Bi rojan dibêje bi dawî nabe. Ji bo dengbêj jiyan û hemû tiştên di jiyanê de dibe bingeha kilamê. Di kilamên dengbêjan de û di dengê wan de dîrok diherike. Ji ber vê yekê dengbêj deryaya kilam, stran û deryaya muzîkê ye. Dengbêjî ji bo kurdan bingeha her tiştî ye. Bingeha dîrokê, çandê, hunerê, wêjeyê bingeha rêzimanî ye. Lê mixabin kurd rastiya dengbêjiyê naşopînin, ew çand û hunera kevnare naparêzin. Ji bo çanda xwe ya kevnare, ji rastiya xwe dûr nekevin, divê hemû kurd ji dengbêjan hez bikin, bi zanyarî nas bikin. Ji ber vê yekê divê mirov li dîrokê binêre.

Li Mezopotamyayê dîroka muzîkê

Mezopotamya 4000 hezar sal berî zayînê bû dergûşa şaristaniyê. Li vê xaka bi bereket; Sumer, Hurî, Gutî, Akad, Babîl, Med, Hîtît, Kalde, Elem, Pars şaristanî ava kirine. Berî mîladê di 331'ê de Îskenderê Mezin serdestiya persan xira kir û xist bin hikumdariya xwe.

Xaka Mezopotamya, ji aliyê erdnigariyê ve cihekî bi nav û deng e. Li başûrê Kabîlê ereb, li rojava Hîtît, Frîgya, Fenîke, Misir û Yewnanistan li bakur Îndu, Germen, li rojhilat jî Hindistan bandora xwe li ser Mezopotamyayê kiriye. Evqas jî Mezopotamya bandora xwe li ser wan welatan kiriye. Muzîka Mezopotamyayê li wan welatan bandora xwe daye û amûrên muzîkê jî bi pêş xistine.

Berî mîladê 4000 salan di zîguratên sumeran de kirinên olî bi awayên helbestî xuya dikin. Berî mîladê 2000 salî duayên sumerên ji ber rahîp û koroyên tê gotin, ji wan re dibêjin 'responco' û dîsa du koroyên bi guhertin digotin navê wî 'antîphone' bi wî rengî dihate gotin û tê zanîn.

Ji duayên bi rîtma sumeran re gir dihate gotin. Sumeran jî ji qamîşê bilûr çêdikirin. Ji stranên olî re jî digotin 'ersemma'...

Tembûrên sumeran ên têne zanîn ev in: bilûra rast û çep lêdixe "Tîg" an jî "Tîggi", defa biçûk "beloç" du defên bi hev re lîlîs û def "a depo".

Li bajarê Ûrê di kolanên arkeolajiyê de tiştên tê xuyakirin ji tembûra 'zammeru'yê re muzîk dibêjn, nam dibêjin, her wiha dîsa qala lîrî jî dikin. Bi lîrên kenanî ji dengên xurt re dibêjin "saggal" ji dengên zirav re dibêjin "sagsal".

Berî mîladê 1800 salên di şaristaniya Akadê de çandeke dewlemend tê xuyakirin. Li xaka babîlan der heqê muzîkê de tiştek nayê xuyakirin. Pir kêm îlahî hene. Li gorî asûriyan di cemaetên olî de rahîbên wan qeydê fermî gotine. Di şahiyên gel de qralên asûriyan jî tevli şahiyan bûne û di wan şahiyan de muzîk gel coş dikir.

Di dema Medan de jî li dema agir şahiyê dibûn ji avesta îlahî stran digotin. Di dema Keldaniyan de jî berî mîladê 626-538 di dema qralê 2'yêmîn Nabuşhadnezar de komek leşkerên bi tembûr hebû. Em wê rastiyê piştî vê bûyerê 400 şûnde hatine nivîsandin, ji pirtûka Danîela dixwînin.

Ji wan mînakan tê xuyakirin li şaristaniya Mezopotamyayê, şaristanî ketine nav hev navê şaristaniyan cuda be jî wan şaristaniyan bandor li ser hev çêkiriye û piştre jî li ser hemû şaristaniyan bandora çandî û hunerî kirine.

Ji destpêka dîrokê dengbêjî

Der barê dengbêjiyê de di rûpelên dîrokê de belgeyên xurt tune ne. Ji ber ku di dîroka kurdan de bi awayekî nivîskî nehatiye nivîsandin. Ji nivîsê bêtir, gotin bi pêş ketiye. Bi pêşketina gotin, pêşketina ziman û her wiha pêşketina dengbêjiyê bi xwe re aniye. Dîroka dengbêjiyê bi dîroka gelê kurd ve girêdayî ye. Ji bo vê yekê divê mirov li dîroka gelê kurd binêre.

Di dîroka derketina kurdan de, di dema neolîtîkê de tê xuyakirin. Di kolandinên arkeolojîk de û li gorî nerînên arkeologan, mirov dikare bibêje ku dîroka gelê kurd digihîje neolotîkê. Kurd gelekî zagrosî ne. Çanda kevnare û bingehê mirovatiyê tê hesibandin çanda Tel Xelefê. Çanda Tel Xelefê weke bingeha neolotîkê tê zanîn. Bingeha peyva Kurdistan ji peyva' kur' tê. Vê peyvê cara yekem Sumeran aniye ziman û tê wateya 'çiyayî'. Dîroka kurdan bi nêzikayî dawiya dema cemidandinên berî zayinê 2 hezar salan dest pê kiriye û di navbera Toros û Zagrosan de, li kêleka avên mezin di çanda pêşketiye de cihê xwe girtine. Mirov dikare bibêje dîroka kurdan jî bi şaristaniya kurdan dest pê kiriye. Kurdan hîmên neolotîkê çêkirine û di gelên aryenê de gelekî kevnar e. Koka çanda aryenan jî yek di serî de gelê kurd dikişîne. Her çiqas belgeyên xurt tune bin jî îro hîn jî di jiyana gelê kurd de şopên wê demê tên xuyakirin. Di zimanê kurdî de jî ew wate zêde ye. Ji ber nivîs bi pêş neketiye bi devkî gotin ziman gelekî bi pêş xistiye. Ziman û çanda kurdî muhtemelên berî zayînê 2000-1500 sal berê bi awayekî herêmî derketiye. Berî zayînê di 600'î de kurd tên nasîn. Bi hûriyan re di rûpelên dîrokê de cihê xwe digirin. Hûriyan bi sumeran re li hemberî hev geh êrîş geh bi parastinê bi hev re têkoşîn kirine. Kurd, bi Babîl, Asur, Hîtît, Îskît, Pers û Helenan re jî têkilî daniye. Kurd di dîrokê de Hûrî Gutî, Mîtanî, Naîrî, Kasît û her wiha dewleta Medan ava kirine. Medan li ser çanda Helenê gelek bandor kiriye. Mirov kare vê rastiyê di pirtûka Heredot de bibîne.

Dengbêjî çawa derketiye

Derketina dengbêjî baş nayên zanîn. Lê belê li gorî metoda diyalektîk û zanyarî mirov dengbêjî binirxîne mirov wê bigihêje armancekê. Di kurdan de nivis pêş neketiye, soz û gotin pêş ketiye. Ji ber vê zimanê kurdî bi gotinkî bêtir dewlemend e. Di kurdan de cih bi kûrahî nayê xuyakirin. Ji ber ku kurd di dîrokê de jiyana xwe her dem bi hiyerarşiya eşîrê derbas kirine. Mirov dikare bibêje ku kurd gelekî zozanî û koçber e. Vê rastiyê li ser ziman û çandê, muzîkê û dengbêjiyê jî hinek tiştan ji me re dide xuyakirin.

Di civaka kurdî de argumanên folklorik bi giranî destan in. Û ev destan gelemperî destanên lehengiyê û şerûdiyê tîne ziman. Destana Memê Alan û Zal û kurê wî Rustem mînakên xurt in. Wan ezgiyên destanan mirov dikare bi muzîka Sumeran girêbide. Ji ber ku argumanên muzîka Sumer û kurdan nêzî hev in. Di tabletên sumeran de demê pêş li zîguratan ji bo yezdan rîtm û muzîk dertê. Bi awayên mîtolojîk ev muzîk dikeve rengê mîstîk. Di kurdan de, di dema şerekî de bi muzîka mîtolojîk pêş dikeve, piştre bi destan bi awayê lorînan ji ber dengbêjan tê gotin.

Dengbêjên ewil kî ne? Jin e an zilam e; bersiva vê pirsê dîrok ji me re dide xuyakirin. Derketina muzîka kurdî bi xwe re girêdayiye. Kurd di xwezayeke gelekî xweş û ew qas jî di xwezayeke pir zahmet de dijîn. Ev ne bes e her dem xwe di nav şer û têkoşînê de dibîne. Di nava xwezaya zehmet û şerî de jin, zilamê xwe çûna wî dîtiye hatina wî nedîtiye. Her tim wê xemgîniya xwe bi lorînan aniye ziman. Di nav kurdan de rastiya bi qîr, tililî, ev qas kurahî be sedema wî bi dîrokê ve girêdayî ye. Di nav kurdan de mîtolojî, efsane û destan tê zanîn bingeha xwe jî neolotîkê digire. Çawa? Li cem kurdan nivîs pêş neketiye, dibistan û zanîngeh jî di jiyana kurdan de xuya nabe. Lewra kurd gelek zozanî ne. Li cem gelên zozanî xwendin û nivîsandin pir pêş nakeve. Ji bo vê yekê kurd mîtolojî û efsaneyan kevnar e evqas zanibin, bi saya devlemendiya gotin û dengbêjan e. Kilamên dengbêjan bi serê xwe bersiva vê pirsê dide.

Di dengbêjiyê de têkiliya hoste û şagirt heye. Yek ji yekî hunerê digire. Dengbêj bi makam kilam ji hosteyê xwe digire û kilamên dîrokî yek ji yekî digire û hatiye roja me. Dengbêj bi kilamê ruh dane destan, efsaneyê û mîtolojiyan. Dengbêj, dengbêjekî berî xwe nas dike. Lewra, hemû dengbêj bûne mamoste ji dengbêjekî nû re.

Em dengbêjiyê di jiyana kurda de her dem dibînin. Hunermendên her demî ne. Deng didin helbestên Feqiyên Teyran. Dibe derwêş ji bo mewlûda Meleyê Cizîrî. Di bin evindarê mîna Mem û Zîn, mîna Derwîş û Edûlê û mîna Binevşa Narîn û Cembelîkê Hekariyê. Çiya bi çiya digerin, ji Sîpan û Araratê heta Engîzek û ji vir xwe berdidin Cûdî, çiyayê Şengalê. Wek gulekê tu çiqas wan bêhn bikî, ev qas bêhn dide. Tu çiqas wan guhdarî bikî ev qas jî distrên. Civata xweş û geş dikin, şahiya mezin dikin. Dostê evîndaran e. An li gundekî li mala şivan dibin şivan, li mala mir dibin baş mêvan. Li ku bin karê wan strandine. Warê wan tûrikê kilamê wan in. Ma xanê bela sebeb negotiye "deng bide dengê dengbêjan", feqi bela sebeb geh çivîkan guhdarî nekiriye, geh dengbêjan.

Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî yek ji helbestvanên herî mezin e. Ehmedê Xanî, di sala 1651'ê de hatiye dinê. Cihê ku hatiye dinê tam ne diyar e. Li gorî gelek lêkolîner û nivîskaran, ew ji êla Xaniyan bûye. Li ser cihê vê êlê dîtinên cuda hene. Li gor van dîtinan, cihê vê êlê ji Cizîra Botan heta derdora Wanê tê guhartin.

Xanî dema ku 14 salî bûye dest bi nivîsandinê kiriye. Dema ku "Mem û Zîn" temam kiriye 44 salî bûye. Xanî li bakurê Kurdistanê li Bajarê Bazîdê wefat kiriye. Gora wî li Bajarê Bazîdê ye. Tirba Xanî ziyaretgeha xelkê ye.

Xanî, bi "Mem û Zîn"a xwe ya ku destana neteweyî ya kurd e, di dilê kurdan de cihekî bilind girtiye û bi wî awayî di nav gelê kurd de bûye "Xaniyê Nemir."

Xanî ji bilî Mem û Zînê hin berhemên din jî nivîsandine. Wekî; Eqîda Îmanê û Nûbara Biçûkan. Ehmedê Xanî li Bazîdê ji bo zarokên kurd dibistanek vekiribû û li wê dibistanê bi kurmancî ders dida zarokên kurd.



BOYAX

Ji van çar (4) wêneyan yek cuda ye. Gelo kîjan?

BERSIV

Wêneyê "3" cuda ye; porê jinika porzer kin e.

Hevalên delal, wekî mînaka "GERDÛN"ê hûn jî dikarin peyvên li jêrê ji tabloyê bibînin û yek bi yek xêz bikin?

xerat, hewlêr, parzemîn, pêşeroj, netewe, kar, paşeroj, gerdûn, pîrejin

T	H	N	H	T	B	Q	R	K
A	G	E	Y	E	H	G	J	N
R	E	T	Q	R	W	O	R	I
E	R	E	L	Z	R	L	N	J
X	D	W	N	E	K	X	Ê	E
N	Û	E	Ş	A	C	X	X	R
D	N	Ê	R	M	X	L	L	Î
Y	P	A	Ş	E	R	O	J	P
K	N	Î	M	E	Z	R	A	P

Dîroka perwerdehiya

Fêrgeh

Adar Jiyan
adarjiyan@mynet.com

Pirsa, "çima zimanê zikmakî?" pirseke pir girîng û di cih de ye. Çimkî hemû lêkolîn û dahûrandinên zanistî ji bo bersiva vê pirsê (ango bersiveke têrker) di nav hewldan û peyitandinên nû de ne. Lêkolînên zanistî û peyitandinên nû, hînbûna zimanê zikmakî dispêrên malzaroka dayîkê û wê wekî destpêka hînbûna zimên nîşan didin.

Zarok, hê di betnê/zikê (malzaroka) diya xwe de (di çar mehiya xwe de) dengê lêdana dilê dayîka xwe guhdarî didêre. Û ji rewşa diya xwe ya hişmnedî, cestî û derûnî rasterê bandorê digire. Piştî jidayîkbûnê jî kesa ku herî pir nêzîkî zarokê ye dîsa dayîk e.

Zarok heta şeş saliya xwe wekî berxika ber şîr bi dayîka xwe re ye û qet jê naqete. Li gorî lêkolînên zanistî zarok ji roja ku ji dayîk dibe û heta şeş saliya xwe nêzîkî 2500 peyvî ji diya xwe hîn dibe. Beramberiya van peyvan heyînên razber û şênber bi saya vî zimanî dinase. Û ev 2500 peyv sermayeya zarokê ya sereke û herî dewlemend e. Zarok, ji herkesî bêtir li axaftina diya xwe guhdarî dike. Dengrêzî, dengzanî (fonetîk) kirpandin û newaya (melodiya) zimanê dayîka xwe teqlîd dike. Ango zarok pêşî ziman ji diya xwe fêr dibe. Ji bo wê ji zimanê mirov ê sereke re "zimanê dayîkê /zimanê zikmakî" tê gotin. Ji bo wê girîngiya perwerdehiya bi zimanê zikmakî tu car nayê nîqaşkirin.

Perwerdehiya bi zimanê zikmakî heyîn û heyberên der û dor bêtir bi zimanê dayîka xwe disêwirîne. Ji bo wê, mirov dikare li vir çend xalên girîng derpêş bike:

1. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, têgihiştina mirov û zanayiya wî/wê ya bingehîn e.

2. Pewrerdehiya bi zimanê zikmakî ahengdariya mirov a bi der û dora wî/wê re lezgîntir û têkûztir dike.

3. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî pêwendiyên mirov ên bi mirovên din re xurtir û ewledartir dike.

4. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî bixwe-ewlehiya mirov zêdetir dike.

5. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî nasîna welat, erdnîgarî û cîhana ku mirov tê de dijî hêsantir dike.

6. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî fêmkirina çîrok û çîvanokên ku mirov lê guhdarî dike hêsantir dike û nîgaş û nîgariyên mirov bi xeml û xêztir dike.

7. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, rêzdayîn, hezkirin û lihevkirina mirov a bi der û dora wî/wê re xurtir dike.

8. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, axaftin û bilêvkirina mirov têkûztir dike.

9. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, mirov ber bi çalakiyên çandî, hunerî, muzîkê ve dike.

10. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, hezkirina mirov a ji mirov û heyberên xwezayê yên din zêdetir dike.

11. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, cihêwaziya navbera zimanên cîhanê û tehemûlkirina van cihêwaziyan bi mirov dide fêmkirin.

12. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, nasnameya mirov diyar dike.

13. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, ji bo hînbûna zimanekî din pileya sereke ye.

14. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, pêwendiyên mirov ên bi der û dora wî/wê ya nêzîk û dûr xurtir dike.

15. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, ji bo danasîn û watedayîna der û dor û civakê dibe alîkar.

16. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, deriyê pêşketina zanayî û behredariya mirov e.

17. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, ji bo çand û civakên cihêwaz dibe navgîn

18. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, hevhîkariya navbera çand û civakan xurtir dike.

www.arsivakurdi.org

ROJEV
19 Nîsan 2009 Hejmar:4 Sal: 1

ROJEV
Zin Basın Yayın
İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu
Yazı İşleri Müdürü
Cesur YILMAZ
Adres:
Şehit Muhtar Mahallesi
Yoğurtçu Faik Sokak No:12/2

Beyoğlu - İstanbul
TEL: 0 (212) 253 93 34
Fax: 0 (212) 244 06 52
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A

Sefaköy - Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu
Gazetecilik,
Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstiklal mah. İstiklal. Cad.
No: 44 Seyhan
Edene
Yayın Türü: Süreli

Xwe ji nexweşiyên biharê biparêzin!

Guherîna demsalan ji bo tenduristiya mirovan xetereyê jî bi xwe re tîne. Dr. Mehmet Antmen diyar kir ku divê bi taybetî biharê kal, pîr û zarok tedbîran bigirin û xwe biparêzin

Guherîna demsalan bi xwe re hin nexweşiyan jî tîne. Serokê SES'a Edeneyê Dr. Mehmet Antmen diyar kir ku bi guherina demsalê ji ber ku welatî xwe naparêzin ev yek dibe sedema hin nexweşiyan.

Bi hatina biharê hin nexweşî jî derdikevin holê. Bi taybetî alerjî, zekem û bêhntengî di vê demsalê de nexweşiyên ku herî zêde tên dîtin in. Serokê SES'a Edeneyê Dr. Mehmet Antmen diyar kir ku bi hatina biharê kulîlk vedibin. Polenên kulîlkan di mirovan de dibe sedema alerjiyê û bi taybetî jî di pîr, kal û zarokan de dibe sedema krîza astimê. Ji ber vê yekê jî divê zarok, kal û pîrên ku nexweşiya astim, bronşît û dil heye xwe ji polenan biparêzin.

Antmen wiha got: "Bi taybetî kesên nexweş divê li cihên li kulîlk û dar dûr bisekinin. Dermanên xwe bi rêk û pêk bi kar bînin. Xwe zêde newestînin û xwêdan nedin. Divê kesên nexweş van pêşniyaran paşguh nekin." **EDENE / DÎHA**

Li xwarina xwe baldar bin

Dr. Antmen diyar kir ku bi hatina biharê welatî zêde xwe naparêzin û wiha axivî: "Ligel van nexweşiyan ji ber ku bedena mirov qels dibe nexweşiyên weke zekemê jî peyda dibin. Ev nexweşî pir girîng nayê dîtin. Lê divê mirov xwe baş biparêze. Bi taybetî jî zarok û kesên ku ji 60 salî mezintir in bi germbûna hewayê nexapin. Cilên havînê zû li xwe nekin. Dema ku nexweş dikevin divê hema biçin bijîşk." Dr. Antmen got ku bi hatina biharê hin nexweşiyên mîde û roviyan jî derdikevin holê. Antmen der barê vê mijarê de jî wiha axivî: "Di demsala biharê de nexxweşiyên mîde yên weke ulser, gastrît û ji nexweşiyên rojiyan jî 'spasît kolon' zêde derdikevin holê. Ji ber vê yekê jî divê guherina demsalê mirov li xwarin û vexwarina xwe jî baldar be." Antmer diyar kir ku bi taybetî di vê demsalê de fêqî bi xavî neyê xwarin dê baş be.

Ava vexwarinê lêkolîn kirin

AGIRÎ - Şaredarê navçeya Diyadînê yê DTP'î Celal Tanriverdî, şebekeyên ava vexwarinê ku ji çiyayê Tendurekê tê nava navçeyê lêkolîn kir. Şaredarê navçeya Diyadînê yê DTP'î Celal Tanriverdî, çavkaniya ava vexwarinê ya gundê Koxê Şêxa ku 65 kîlometre ji çiyayê Tendurekê tê nava navçeyê lêkolîn kir. Tanriverdî ligel barîna berfê bi kîlometreyan meşiya û çû ser kaniya avê. Tanriverdî diyar kir ku bi salan e boriyên avê nehatine tamîrkirin û gelek boriyên avê şikestine. Tanriverdî, anî ziman ku ji ber şebekeya avê bêxwedî ye av têra navçeyê neke û wiha got: "Ger ku şebekeya avê bê parastin, av têra hemû navçeyê dike. Lê belê heta niha tu kesî berê xwe nedaye şebekeyê û seh nekirine. Bi salan e di halê xwe de hatiye hiştin. Me li gorî derfetên xwe tamîra wê kir. Lê divê bi awayekî hemdem û demdirêj tamîr bê kirin. Bi taybetî ev yek ji bo tenduristiya gel girîng e. Em dê di demeke nêzîk de têkevin nava hewldanan û em dê tamîra wê bikin."

Li Serêkaniyê xezal zêde bûn

RIHA - Li navçeya Serêkaniyê ya Rihayê hejmara xezalên hildabûn bin parastinê her diçe zêde dibe. Hejmara xezalên li Midûriyeta Giştî ya Karîgeriyên Çandiniyê (TÎGEM) a di sala 1943'yan de li ser milyonek 700 hezar hektarî hatiye avakirin gihişte 2 hezaran. Rayedarên çewlikê diyar kirin ku berê xezalan ê îsal li gorî salên din zêdetir bûye. Xezalên li qada daristanî diçêrîn wiha ber bi obejektîfên me ketin.

Çarşema Sor hate pîrozkirin

MÛSIL - Êzîdiyên ku li bajaroka Şengala Mûsilê dijîn cejna Çarşema Sor pîroz kir. Êzîdiyên Şengalê li gorî kevneşopiyên xwe serê sibehê xizmên xwe ziyaret kirin. Piştre jî ji aliyê Tevgera Êzîdiyan a Azad (TEVDA) ve şahiyek hate organîzekirin. TEVDA'yê li qontarê çiyayê Şengalê şahî li dar xist û bi sedan êzîdiyên ku li gundên derdorê dijîn beşdarî şahiyê bûn. Serokê TEVDA'yê Saît Hesen Saît di şahiyê de axivî û bal kişand ser zilm û zora li hemberî êzîdiyan. Saît got ku bila cejn bibe wesîleya yekîtiya civakî. Ji ber ku jiyaneke aştiyane girêdayî yekîtiya civakî ye. Piştî axaftinan ksên ku beşdarî şahiyê bûn li ber muzîkê govend gerand.

Cehtir bûye çavkaniya debara wan

Li Hatayê cehtirên ku li qontara çiyayê Musa têne çinîn û di tedawiya gelek nexweşiyan de tê bikaranîn, bûye çavkaniya debara malbatên xizan. Cehtirên li derdora çiyayê Musa tên berhevkirin bi 7 TL'î tê firotin. Cehtir hem weke çay tê bikaranîn û hem jî di xwarin û seleteyan de tê bikaranîn. Welatiyê bi navê Ahmet Balli ku li qontara çiyayê Musa bi malbata xwe re cehtir kom dike û li navenda Samandagiyê difiroşe got ku cinîna cehtirê pir zehmet e. Balli wiha got: "Em weke malbat diçin li qontara çiyayê Musa cehtirê berhev dikin. Serê sibehê em derdikevin qontara çiya û heta êvarê li wir dimînin. Ji ber berhevkirina cehtir destên me parçe parçe dibin. Ev karekî pir zehmet e. Em cehtirên ku berhev dikin jî bi 7 TL'î difiroşin." **HATAY**

Li Silêmaniyê zarokên kur zêdetir in

Li bajarê Silêmaniyê rêjeya ji dayikbûna kuran ji ya keçan zêde bûye. Li gorî daneyên Nexweşxaneya Zayinê ya Silêmaniyê di 3 salên borî de rêjeya ji dayikbûna kuran zêde bûye.

Li gorî daneyên sala 2007'an li sînorê parêzgeha Silêmaniyê 7 hezar û 52 zarokên kur û 6 hezar û 834 zarokên keç ji dayik bûne. Zêdebûna kuran par jî berdewam bû. Li gorî daneyan di sala 2008'an de li herêmê 7 hezar û 42 kur û 6 hezar û 589 keç ji dayik bûne. Daneyên sê mehên borî yên îsal jî diyar dike ku li Silêmaniyê wê dîsa kur ji keçan zêdetir bin. Di sê mehên pêşîn ên sala 2009'an de hezar û 765 kur û hezar û 703 keç ji dayik bûne. Lê di meha kanûna paşîn rêjeya jidayikbûna keçan zêde bûye, ku 635 keç dayik bûne. Mamostayê Zanîngeha Silêmaniyê Ciwan Ihsan, zêdebûna rêjeya kuran wek tiştekî asayî dibîne û ne di wê baweriyê de ye ku bibe pirsgirêk: "Zêdebûna rêjeya rûniştivanên Kurdistanê ne bi vî rengî ye ku nehevsengiyek di navbera rêgezan de çêbibe. Zêdebûna kuran ne girîng e. Ya girîng ew e ku li Kurdistanê rêjeya mirinê kêm bibe." Li gorî daxuyaniyên Wezîrê Tenduristiyê jî rêjeya mirinê li Kurdistanê zêdeye. Xelkê Kurdistanê zêde bi temen nabin û zû dimirin. **SILÊMANÎ** ***(rudaw)***

Wêne: Volkan BORA

Cûdî bi kulîlkan xemilî

Bihar li Kurdistanê rengê xwe yê xweşik nîşan dide. Bi hatina biharê re her dera çiyayê Cûdî bi rengên kesk, sor û zer xemilî. Kulîlkên li her derê vebûne çiyayê Cûdî kirin weke wêneyê ku bi destan hatiye xêzkirin. Kulîlkên ku li çiyayê Cûdî bi hatina biharê vekirîn wiha ketin ber objektîfan.

www.arsivkurdi.org